


## Kapîtalîzma dorpêçdar

Kapîtalîzma dorpêçdar yek ji wan gelek teoriyên bûrjûwa yên "refaha giştî" ye ku xwedan diravê cîhanê bi periyodîk di demên dijwar de civakê didin xwarin, hewl didin ku ji daxwaza şerkirina mafên siyasî dûr bixin... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.8***



## Dewleta serî qûç binî pûç

Wekî nimûne erebe heye motor û parçe nîn in. Balafira bêmirov heye dûrbîn û motor nîn in. Tank û helîkopter hene motora pê bişixulin nîn e. Rêber û serwer wek malxweyî bazariyê dike û mizgîniya derxistin û firotanê... ***Ehmed Pelda / R.7***



## Cejna Xidir Îlyas û Xidir Nebî

Ev hefteya pêşiya me, ya Cejna Xidir Îlyas û Xidir Nebî ye. Ev cejn her çiqas ji aliyê gelek gel û baweriyên cuda ve jî tê pîrozkirin lê wateya wê ji bo êzidiyan cuda ye. Li gorî baweriyê "Xidir Îlyas û Xidir Nebî du milyaketên piştevan in... ***Ayhan Erkmen / R.12***

# xwebûn

15-21 SIBAT 2021 HEJMAR: 61 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Navê tunekirina kurdan: 15'ê Sibatê



Li seranserê Kurdistanê gelê Kurd û dostên xwe di salvegera Komploya Navneteweyî ya 22'emîn a li dijî rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li ser pêyan e. Tişta ku çalakiyên îsal ji yên salên borî cuda dike îdia û têkoşîna îradeya azad e. Li welat û derveyî welat her kes têkoşîna li dijî îşkenceya li Îmraliyê û sîstema tecrîdê weke têkoşîna xwe, weke şertê jiyana demokratîk û azad dibîne û xwedî lê derkeve... ***Felemez Ulug / R.6***

## 22 sal in tê şermezarkirin

Bi derxistina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a ji Sûriyeyê û radestkirina Tirkiyeyê, komploya li dijî Ocalan dest pê kir û bi girtina Ocalan û tecrîdkirina li girava Îmraliyê ya 22 salan koplo didome. Îsal jî komploya 15'ê Sibatê li gelek deveran bi çalakiyan hat şermezarkirin. Gelek partî û rêxistinên kurdan bi daxuyaniyan bertek nîşanî... ***R.3***

# Divê kurdî bibe zimanê fermî

UNESCO'yê bi armanca parastina zimanan, di sala 1999'an de 21'ê Sibatê wekî Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê ragihand. Gelê kurd jî bi salan e vê rojê bi çalakiyên cihêreng, pîroz dike û dixwaze zimanê kurdî bibe zimanê fermî. Li ser rewşa zimanê kurdî û rêyên çarseriyê lêkoler Ibrahîm Seydo Aydogan, mamosteyê zimanê kurdî Samî Tan, nivîskar Ronayî Onen û endamê sekreteryaya TZÇK'ê Bawer Berşev axivîn. Her çaran jî diyar kir ku ji bo zimanê kurdî bi pêş bikeve û xetereyên li serê ji holê rabibin, divê zimanê kurdî bibe xwedî statuyeke fermî û bibe zimanê perwerdeyê...***R.5***

## Li Garê şer û pevçûnên giran

Artêşa tirk di 10'ê sibatê saetên şevê, bi balafiran êrîşî herêma Garê ya başûrê Kurdistanê kir. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî şer û pevçûnên li herêmê daxuyanî da û diyar kir ku di encama pevçûnan de zêdetirî 30 leşkerên artêşa tirk hatine kuştin û gelek herêm bi balafirên şer û helîkopteran hatine bombebarankirin. Artêşa tirk gelek caran hewl da ku leşkerên xwe li herêmê bi cih bike lê ji ber kuştî û birindaran neçar man paşve vekişiyan.
Akademisyenê başûrî Dr. Hawjîn Mela Emîn têkildarî êrîşa Garê û hevkariya PDK'ê ya bi Tirkiyeyê re axivî û diyar kir ku armanca Tirkiyeyê dagirkirina Kerkûk û tevahiya başûrê Kurdistanê ye. Gelê Başûr bertek nîşanî êrîşê da... ***R.6***




## *Piştgiriya ji bo grevê zêde dibin*

*Girtiyên siyasî yên li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê, ji 80 rojî zêdetir e li hemberî tecrîd li ser Abdullah Ocalan û binpêkirinên li girtîgehan di grevên birçîbûnê de ne. Malbat û siyasetmedaran piştgirî dan grevan û xwestin hemû kes bibin dengê girtiyan...* ***R.3***

## Zarokên nîvziman

Yek ji rojeva sereke ya me kurdan ji sed salî zêdetir in perwerdeya bi zimanê zikmakî ye. Ji ber giringiya mijarê ev daxwaz û nîqaşên li ser mijarê her tim hebûye. Sîyaset, îdeolojî, bîr û baweriya me her çi be jî me dev ji vê daxwaza xwe bernedaye û bêguman em ê ji niha şûn de jî dev jê bernedin. Sedem jî ew e ku gelek aliyên perwerdeya bi zimanê zikmakî heye. Ji pedagojiyê bigirin heta aboriyê û ji siyasetê bigirin heta ehlaqê, ji çandê bigirin heta hebûna neteweyî... Mixabin çi qas di rojeva me kurdan jî de be, heta niha ev daxwaz bi cih nehatiye. Wek ku me got... ***Cemîl Guneş / R.8***

## Hekarî û Zeyneme

Hîrê birayî benê. Ê jû di lakî xo benê, namê xo kî Hekarî û Bedran beno. Ê birayê bînî hîrê lacê xo benê, namê xo kî Hemed, Memed û Ûsif beno. Ê bîrayê qikî kî jû kêna xo bena, namê xo kî Zeyneme bena. Rocê êna pîyê Zeyneme û pîyê Hekarî û Bedranî ênê kiştene.
Ap nî domanan ro xêr nêkeno. Nêkî hetê apê xo de nevindenê, hîrmîna jû keye de manenê. Xorê gîyan danê pîya wenê. Maneno benê pîl, benê xort. Hekarî zerî keno kêna apê xo Zeyneme. Lacê apê bînî Hemed kî zerî keno Zeyneme. Anê Hekarî û Zeyneme pîya nîşan kenê pede vanê "Zeyneme nîşanlîya Hekarî'ya." ***Tûrabî Kîşîn /R.9***

## Kaşkirina li serê gir

Li gundekî Hezroyê milîsekî şoreşgeran hebû. Rojekî duşoreşger diçin mala milîs. Baran jî wekî dewê meşkê dibare. Li derî dixin, dayika milîs derî vedike, dinihêre ku şoreşger in.
Dibêje: Wax wax mala min bişewite, de keremkin derbasbin.
Şoreşger dibêjin: Na dayê kanê ji kerema xwe re bang kurê xwe bike. Bila were em ê wî bibînin û em ê herin.
Dayik: Welahî kurê min ne li malê ye, çûye bajêr.
Şoreşger dibêjin ê de baş e. Heke êvarê hat jê re bibêje bila were gel me, em ê li ser wê pirsgirêkê hinekî nîqaş bikin... ***Riza Uyar / R. 10***

## Rêzefîlmên Başûr

Lîstikvana ji Başûr a fîlm û rêzefîlman Sirûşt Cemal bi rojnameya me re axivî. Cemal diyar kir ku Başûr bi giştî di bin bandora rêzefîlmên Kore, Hindistan û Tirkiyeyê de ye. Cemal wiha got: "Tu pêşketinek an jî aliyekî wê yê nû tune ye. Sedema vê yekê xistina civakê ye. Civak ji her alî ve hatiye xistin. Li ser wêje û huner bi kurahî nayê sekinandin. Helbet ev yek jî bandorê dide jiyana gel û têkiliyên wan ên rojane jî. Yanî her çiqas hin tişt hatibin kirin jî niha di hemû aliyên jiyanê de..." ***R. 11***



## Ziman gencîneya gelan e

Helbestvan Dildarê Aştî ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Mixabin hîn jî zimanê kurdî nebûye zimanê sûk û bazarên aborî û teknîkî. Ev demeke dîrokî jê re divê, wisa jî çend nifş pêwist in..." ***R.4***

## Pîvanên klînîkî û grevên birçîbûnê

Grevên birçîbûnê yên dema bi dawî anîna wan nediyar û bêveger ên ku di wateya psîkolojîk û di heman demê de jî di çerçova bijîşkî û civakî de gihîştine qonaxeke pir krîtîk, berî her tiştî acîliyek girîng pêk tînin. Pîvana herî girîng a vê lezgîniyê pîvana "wate dayînê" ye. Di çerçova psîkolojîk/derûnî de, sedema herî girîng ku divê mirovên di greva birçîbûnê de biryarek wusa bidin ew mijarên ku siyasetmedar neçar in ku wan bi rengek çalak çareser bikin. Bi taybetî ya pir girîng ew e ku laş di birçîbûnê de razayî digel birçîbûnê hilweşînek mezin jî bi xwe re tîne. Ev tê vê wateyê ku her rojê bi hejmarek diyarkirî şane ji laşê mirov wenda dibe û ji nû ve pêdiviya laş bi vana çêdibe. Ji ber ku kesên di greva birçîbûnê de ne hin mîneralan.
***Dr. Abdulillah Polat / R.12***



## Fira azadiyê ya çûka bi navê Ferîde

Asîman çavên mirovahiyê ye. Şîn û spî bi hev re di nav xwe de dihewîne. Wek ewr û asîman, wek qîrîn û êş, wek gul û bilbil, wek can û ruh di nav wê jiyana bi hev re de çîrokekê dest pê kiriye. Hebû tunebû çûkek bi navê Ferîde hebû. Çûka bi navê Ferîde li welatê çîrokan, geh li ser çiyan geh li ser çiyayan difire. Çûka bi navê Ferîde ber bi azadiyê ve difire. Dengê wê kêfê dide mirovan. Wexta dengê wê tê zarok bera dû wê didin. Lê nikarin bigihîjin coşa wê.

Roj derbas dibe û çûkên neyar ji hezkirina çûka bi navê Ferîde ya zarok, gel û asîman hêrs dibin. Bi dil û peyvên qirêj hêrs dibin. Çûkên neyar difirin dibêjin ku Ferîde gel dixapîne nanê wan didize û dixwe. Derewên çûkekî neyar ewqas mezin e ku bi xwe jî jixwe bawer dike. Rojekê digihîje gel Ferîde û dibêje 'tu nanê gel dixwî û wan birçî dihêlî'. Ferideka şîrîn çiqas bejê na, neyar bi israr e û dîsa bi gotina xwe dike.

Ferîde êdî mecbûr dimîne, dixwaze xwe îspat bike û dibêje 'were min parçe bike, zikê min veke eger ez rast bim, du şertên min hene'. Neyar disekine, difikire û dibêje 'ka şartên te çi ne?'. Ferîde dibêje 'tu kêrekê bîne û zikê min biqelêşe binêre ka parçeyek nanê gel di zikê min de heye yan na, wê wextê ez ê bimirim, tu bedena min bişewitîne ku ji xweliya min jiyan dîsa dest pê bike!' Neyar ji ber şertê Ferîde û ji ber cesareta wê şaş dimîne lê fersendek ketiye destê neyar dixwaze wê fersendê bernede û şertên Ferîde qebûl dike. Bi lez û bez kêrê tîne zikê wê diqelêşe, parçe dike, canê wê distîne û di hundirê Ferîde de pariyek nan nabîne. Dinêre ku bi destên xwe ew kuşt lê nan tune ye.

Me di destpêka çîrokê de jî got. Asîman çavên mirovahiyê ye. Gazî neyar dike û jê dipirse 'ka bêje kê kuşt?'. Neyar yek bi yek bersiv dide 'min', 'kê şuşt?'. 'min' , kê şewitand 'min', 'kê hilanî?' 'min'. Asîman êdî nahêle biaxive û dibêje 'neyarê zalim, Ferîde çûkek delal û hêja bû bi dengê xwe yê xweş jiyan mest dikir, tenê daxwazek wê hebû. Wê dixwest kenên zarokan zêde be. Lê hêrsa te, qirêjbûna te, ew kuşt û em bê Ferîde man. Ji niha şûn de tu heta mirinê ji şefaqê heta êvarê bi qîrîna xwe bigere û gunehê xwe bêje 'kê kuşt, min kuşt. Kê şûşt, min şûşt. Kê şewitand, min şewitand. Kê hilanî, min hilanî.' Wê hemû cîhan li te guhdarî bike û dengê te biçe mirovan û her tim wê lanetê li te bînin. Ev ceza besî te ye. Lê cezayekî mezin jî ji me re ye ku ew êşa çûka Ferîdeyê ku me nikarî ji destê neyaran ew biparastana. Gora Ferîdeyê jî di dilê me de ye.

*Çavkanî: JinNEWS / Derya Arslan*

# Du beden û ruhek!

Navenda Nûçeyan

**Ji ber vê yekê xweza û jin di du bedenan de ruhek in. Ew ruh bi hev re tevdigerin, jin hêza xwe ji xwezayê, xweza jî hêza xwe ji jinan digire. Her du bi hev re xwe nû û zindî dikin**

Hefta borî mîhrîcana Kolyada ku wek cejneke di nav gelên slav de tê pîrozkirin, dest pê kir. Di vê cejnê de ku dê du hefteyan bidome, gel veguherandina rojên zivistanê ya rojên havînê û her wiha bi lîstikên cuda hilanîna rojê pîroz dikin. Ev cejn temsîla sala nû dike û li cihên cuda yên cîhanê ji aliyê ortodoksan ve tê pîrozkirin. Li gorî hin çavkaniyan Kolyada xwedayê rojê yê zivistanê ye û li gorî hin çavkaniyan jî xwedayê kêfxweşiyê ye. Lê ji ber ku ev roj herî zêde ji aliyê jinan ve tê pîrozkirin û heta bi xwedîderketina jinan hatiye van rojan, li gorî min ev roj cejneke xwedawendan e.

Ev gelên bi xwezayê re dijîn, bi taybetî jin bi rîtuelên cuda hatina sala nû û dema çandiniyê bi şahiyan pîroz dikin. Bi taybetî jin ji bo sala nû û ji bo çandinî bi bereket be li derdora darê direqisin, hem ji bo şînbûnê cesaretê didin darê hem jî bi vî awayî bi xwezayê re dibin yek.

Yekbûna xweza û jinên slav tenê mînakek e. Di serî de li Kurdistanê li her derê cîhanê jin bi rîtûelên cuda girêdana xwe bi xwezayê re tînin ziman. Ev girêdan carna dibe cejn tê domandin, carna dibe bawerî, carna dibe totem û hwd. Lê di bingeha hemû tiştan de girêdanek bi xwezayê re heye.


Mirov dikare vê girêdanê hîn şênbertir bike. Mînak, dema hewa bi ewr be û girtî be bêyî ku sedemek hebe jin xemgîn dibin, lê hewa bi tav be jin kêfxweş dibin bi kelecan dibin. Her çiqas sedema vê yekê baş neyê penasekirin jî, ev di rastiyê de têkiliya xwe bi xwezayê re heye. Jin û xweza bi her awayî yek in, her du jî li hemberî pergala heyî serhildêr in û serî natewînin.

Em dibînin dema xweza hêrs dibe tofan radibe, her tişt serobino dibe û jiyan disekine. Heman tişt ji bo jinan jî derbasdar e. Dema jin jî li hemberî desthilatdariyê hêrs dibin civak radibe ser pêyan, jiyan tê asta sekinandinê. Pergal neçar dibîne li hemberî serhildêriya jinan gav paş ve biavêje.

Ji aliyê din ve herî zêde jin li hemberî talankirina xwezayê derdikevin, herî zêde dilê jinan li hemberî talankirina xwezayê diêşe, wekî ku parçeyek ji bedena wan biçe ruhê wan diêşe.

Ji ber vê yekê xweza û jin di du bedenan de ruhek in. Ew ruh bi hev re tevdigerin, jin hêza xwe ji xwezayê, xweza jî hêza xwe ji jinan digire.

Xweza di her êrîşa pergalê de xwe ji nû ve şîn û zindî dike, jin jî di her êrîşê de xwe ji nû ve şîn û zindî dike. Her du jî dest ji hebûna xwe bernedan û bernadin jî.



# Kampanyaya 'Ji bo Jinan Edalet' hat destpêkirin

Meclisa Jinan a HDP'ê di çarçoveya kampanyaya 'Destpêkê Edalet' ya di 8'ê sibatê de hatibû destpêkirin, kampanyaya 'Ji bo jinan edalet' jî dan destpêkirin. Jin ji bo bernameya xwe aşkera bikin li Parka Kugulu ya Enqereyê kom bûn. Jinan maskeyên bi nivîsa 'Ji bo jinan edalet' dan ber devê xwe û dirûşmên 'Ji bo jinan edalet' û 'Jin jiyan azadî' berz kirin. Di çalakiya bernameyê de berdevka meclisê Ayşe Acar Başaran destnîşan kir ku ew ji bo jinên girtî, li dijî tecrîdê, tevkujiya jinan, pergala qeyûman, feqîriyê, tundiyê, zextên li ser jinên ciwan û talankirina xweza û parastina jiyanê dibêjin edalet. ***ENQERE***




# Êş û bêdengiya xwe bi rêya xêzkirina wêneyan nîşan dida

Şêwekar bi rêya xêzkirina wêneyan, dikarin hestên xwe bi civakê re parve bikin. Şêrîn Xelef a ku ji hezkirin û hembêza dayika xwe bêpar mabû, hemû êşên ku jiyane û bêdengiya xwe bi xêzkirina wêneyan dide der. Şêrîn Xelef 39 salî ye û dayika 3 zarokan e. Piştî ku di sala 2004'an de dizewice ji ber kêmderfetiyan dûrî şêwekariyê dibe.



Şêrîn Xelef ji sala 2018'an ve di Komîteya Çand û Hunerê ya Kantona Hesekê de cih digire. Piştî ku 15 salan dûrî xêzkirinê dibe, dîsa di sala 2019'an de li pîşeya xwe vegeriya. Hemû wêneyên xwe bi pênûsa risas û fehmê xêz dike, her wiha hewl dide ku di demên pêş de pêşangeheke taybet ew bixwe veke.

Ji ber ku Xelef nedixwest êşa xwe ji kesekî re vebêje, hemû bêdengiya xwe bi rêya xêzkirina wêneyan nîşan dida. Şêrîn Xelef tenêtiya bi çûyîna dayika xwe hîs dikir, wiha anî ziman: "Gelek biçûk bûm dema dayika min çû rehmetê, bêdayikbûn êşeke gelek mezin e. Heya niha ev êş di dilê min de ye. Dema ku min dayika meta xwe û keça wê yan dayika hevalek xwe didît ku porê wan çêdike, gelek aciz dibûm û min ji xwe re digot 'Niha dayika min sax bûya wê keziyên min çêbikira'. Rast e xwişka min a mezin porê min şeh dikir lê ne weke dayikê ye. Êşa ku min di zaroktî de dît û kêmaniya ku min dît, bû sedem ku ez hêza xwe di şêwekariyê de bibînim. Dema ez diketim tengasiyê min berê xwe dida kaxiz û pênûsê û min bêdengiya xwe di nav pelan de vedişart. Her dema ku min wêneyek çêdikir, digot qey min cîhanek ava kiriye û hemû êşa xwe ji bîr dikir." **HESEKÊ**




# 8'ê Adarê dê bi greva jinan pêşwazî bikin

Yekitiya Jinên Sosyalîst (SKB), der barê 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê de daxuyaniyeke nivîskî weşand. SKB'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku di rojên ku êrîşên li ser jinan zêde dibin de 8'ê Adarê ji jinan re dibe hêvî û da zanîn ku ne gengaz e dîroka ji têkoşîna jinan tiştî tune bê hesibandin. SKB'ê destnîşan kir ku şertên pandemiyê û qeyrana aboriyê, mêtina keda jinan zêdetir kiriye û komkujiya jinan di qeyrana koronayê de jî berdewam dike û wiha got: "Me têkoşîna azadiyê ya jinan û piştevaniya jinan a enternasyonal mezintir kir. Niha jî bi kerb kolanan tijî dikin û qîr dikin. Em edaleta jinan in. Em li dijî tundî, îstismar û zayendiyê xwe diparêzin û bêdeng nabin. Li dijî cînayetên jinan, ne ji bo edaleta zilam ji bo edaleta rastî, ji bo ji tundiya zilam û dewletê re bêjin bes, em ê di 8'ê Adarê de li kolanan bin. Em hemû jinan û LGBTÎQ+'yan vedixwînin grevê. Em ê 8'ê Adarê bi greva jinan pêşwazî bikin." ***STENBOL***

## Ji ber santralê nexweşî zêde dibe!

Her diçe hewaya Îdirê qirêjî dibe. Li gor "Rapora Reş a 2020'an a Hewaya Qirêj û Bandora Li Tenduristiyê" ya Platforma Mafê Hewaya Paqij, di 4 salên dawî de welatiyên herî zêde hewaya qirêj hildimijînin welatiyên Îdirê ne. Ji ber santrala nukleerê ya li Ermenistanê li Îdirê rêjeya pençeşêrê zêde dibe. Parlamenterê HDP'î Habîp Eksîk diyar kir ku ji ber bikaranîna sotemeniyên fosîlî û ji ber ku deşt û newal dikevin ber îmarê jî, welatî hewayeke pir qirêj hildimijin. ***ÎDIR***

## Bi dehan kes hatin binçavkirin

Operasyonên girtin û binçavkirinê yên li hemberî siyasetmedarên kurd vê hefteyê jî dewam kirin û bi dehan kes hatin binçavkirin. Polîsan li Kocaeliyê bi ser gelek malan de girt û 13 HDP'î binçav kirin. Li navçeya Pilemûriyeyê ya Dersimê velatiyê 65 salî yê bi navê Velî Yildiz bi îdiaya endamtiya rêxistinê hat girtin. Li Konyayê hevserokê HDP'ê yê navçeya Kûlû yê berê Suleyman Înan jî di nav de 7 kes bi hinceta parvekirinên medyaya civakî hatin binçavkirin. Hevseroka HDP'ê ya bajêr a Qersê Sevda Sûbaşi jî hat binçavkirin. ***AMED***

## Piştgiriya ji bo Bogazîçiyê didome

Piştgiriya ji bo berxwedana xwendekarên zanîngeha Bogazîçiyê berdewam dike. Hefteya borî jî di serî de li Stenbolê, li gelek bajaran çalakiyên piştgiriyê hatin lidarxistin û bi dehan kes hatin binçavkirin û her wiha gelek kes jî hatin girtin. Li aliyê din akademîsyenên zanîngehên Galatasaray, Stanbol, ODTU û gelek zanîngehên din jî piştgirî dan çalakiyan û bertek nîşanî tayînkirina rektorê qeyûm ango Melîh Bulu dan. Bi hinceta ku li ser dîwaran nivîs nivîsandine û bertek nîşanî tayînkirina Melîh Bulu dane 5 xwendekar hatin binçavkirin. ***STENBOL***

## Fatoreyên ceyranê gel bêzar kir

Şîrketa Belavkirina Ceyranê ya Wangoluyê (VEDAŞ), piştî ku saetên aboneyên xwe derxistin ser dîrekan, fatoreyên aboneyan 2-3 qat zêde bûn. Ji aboneyan re ji 100 TL'yî heta hezar TL'yî fatore hatine. Fatoreyên mijara gotinê ne tenê bi ser telefonê bi peyameke kurt ji aboneyan re tê ragihandin û tu hûrgiliyeke mîqdara bikaranîna ceyranê di wan de tune ye. Ji ber vê yekê abone hem ji fatoreyên zêde hem jî ji nedîtina hûrgiliyên bikaranîna xwe ya ceyranê bi gaz in din. Welatiyan got ku ji ber zêdebûna buhayê fatoreyan matmayî mane. ***WAN***

# 22 sal in komplo tê şermezarkirin

| Navenda Nûçeyan

Bi derxistina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a ji Sûriyeyê û radestkirina Tirkiyeyê, komploya li dijî Ocalan dest pê kir û bi girtina Ocalan û tecrîdkirina li girava Îmraliyê ya 22 salan koplo didome.

Îsal jî komploya 15'ê Sibatê li gelek deveran bi çalakiyan hat şermezarkirin. Gelek partî û rêxistinên kurdan bi daxuyaniyan bertek nîşanî komployê dan. Girtiyên siyasî yên li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê dimînin bi heman armancê daxuyanî dan û komplo ku ji aliyê kurdan ve wek 'roja reş' tê pênasekirin şermezar kirin.

Parêzerê Ocalan Prz. Cengîz Yureklî têkildarî komployê ji Ajansa Mezopotamyayê (MA) re axivî û diyar kir ku ji ber tecrîdkirina Ocalan di qada siyasî, aborî, tenduristî û gelek qadên din ên jiyanê de qeyran kûr dibe û wiha got: "Bi tecrîdê dixwazin Ocalan teslîm bigirin. Lê sekna Ocalan a 22 salan ev polîtîkayên tecrîdê pûç kiriye." Yureklî helwesta DMME û CPT'ê ya li hemberî tecrîdê rexne kir û anî ziman ku ev saziyên navneteweyî rola xwe cih naynin û ev sazî tenê raporan amade dikin.

Jinên aktîvîst ên Tevgera Jinên Azad (TJA) li dijî komplo û tecrîda li ser Ocalan nerazîbûnên xwe anîn ziman û banga bidawîkirina tecrîdê kirin. Aktîvîsta TJA'yê Naşîde Toprak komploya li dijî Ocalan şermezar kir û destnîşan kir ku komplo di heman demê de êrişek li dijî desteftiyên azadîxwaz ên jinan e û ew ê li dijî vê li her qada jiyanê têbikoşin.

Di rojnameya Il Manîfestoyê ya Îtalyayê de bi wesîleya salvegera komploya navneteweyî ya li dijî Ocalan di rûpelekî de îlana 'Azadî ji Abdullah Ocalan re hate dayîn'.

# Deng bidin qîrîna li girtîgehan

**Çalakiya grevên birçîbûnê ku li dehan girtîgehan hatiye destpêkirin berdewam dike. Malbatan û siyasetmedaran piştgirî dan çalakiyê û xwestin hemû kes bibin dengê girtiyan**

| Navenda Nûçeyan




Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 21 sal in li Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Îmraliyê girtî ye û binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya girtiyên siyasî ku koma 16'emîn dewr girtiye zêdetirî 80 roj in didome.

Bi heman armancê zêdetirî 60 roj in li Kampa Penaberan a Mexmûrê û nêzî 50 roj in li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê grevên birçîbûnê hatine destpêkirin.

Xizmên girtiyan destnîşan kir ku ew bi girtiyan re ne û çalakiya wan dê bi ser bikeve. Nebahat Şakar a dayika Kenan Şakar ku 4 sal in di Girtîgeha Wanê ya Tîpa F'yê de ye wiha got: "Girtî, ji bo xwe, gelê xwe û rêberê xwe di greva birçîbûnê de ne. Abdullah Ocalan, 22 sal in girtiye. Girtî, vê qebûl nakin û ji ber vê dest bi greva birçîbûnê kirine. Kurd, divê gişpiştgiriya wan bikin. Heger wisa be, dê kes nikaribe van tiştan bîne serê me."

Pakîze Başak ku kurekî wê di girtîgeha Silîvrî û kurek wê di Girtîgeha Wanê ya Tîpa F'yê de ye, destnîşan kir ku daxwaza girtiyan azadî ye. Behîce Abî destnîşan kir ku çi dibe bila bibe divê tecrîd rabe û wiha got: "Dayik, dixwazin tecrîda li ser Abdullah Ocalan rabe û azad bibe."

Girtiya bi navê Fîgen Şahîn niha di Girtîgeha Alîaga Şakran a Îzmîrê ya Jinan de ye û demên berê jî 96 rojan di greva birçîbûnê de mabû. Xwişka wê Nûrgul Tûrgal da zanîn ku li ser girtiyan zext zêde bûne, poşmaniyê li girtiyan didin ferzkirin û divê dewlet daxwazên girtiyan qebûl bike.

Girtî Emre Can Demîr ê li Girtîgeha Eskîşehîrê ya Tîpa H dimîne û li dijî tecrîdê ket grevê. Bav Hasan Demîr bang li her kesî kir ku deng bidin qîrîna li girtîgehan.

**Rasterast mafên mirovan**

Seroka Konseya Navendî ya TTB'ê Şebnem Korur Fincanci, xwest daxwazên girtiyan pêk bên û wiha got: "Ev daxwazên girtiyan rasterast bi mafên mirovan re eleqedar in. Wekî TTB'ê ev yek berpirsiyariya me ye jî."

Hevserokê HDP'ê Mîthat Sancar di kongreya partiya xwe ya Colemêrgê de axivî û bal kişand ser greva birçîbûnê ya li dijî tecrîdkirina Ocalan û wiha got: "Em tecrîda li Îmraliyê rakin. Em dizanin birêz Ocalan dixwaze ji bo çareseriya demokratîk, aştiya demokratîk wezîfeyên girîng pêk bîne û bo vê yekê jî amade ye. Dijderketina tecrîdê û parastina aştiyê rê vekirina çareseriyê ye. Divê teqez em dengê girtiyan bibihîzin."

HDP'a bajêr a Agiriyê, li avahiya xwe bi dirûşma "Em li dijî faşîzmê bibin yek, xwe bi rêxistin bikin û têkoşînê bilind bikin" civîneke gel li dar xist. Hevserokê DBP'ê Keskîn Bayindir di civînê de axivî û wiha got: "Heke tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan neşikê dê rejîma heyî û polîtîkayên wê bidomin. Em bang dikin ku em tev bi hev re li dijî tecrîdê derkevin û zihniyeta qeyûm parçe bikin."

Komek endam û rêveberên HDP'ê, bi tevlêbûna parlamenterên HDP'ê, li dijî tecrîdê li navçeya Qilebanê ya Şirnexê daxuyanî dan. Komê di çalakiyê de pankarta "Tecrîd sûcê mirovahiyê ye" vekir û dirûşmên "Bijî berxwedana zindanan" berz kirin.

**Her der hatiye tecrîdkirin**

Rêxistina HDP'ê li Qilebanê der barê tecrîd û çalakiyên greva birçîbûnê de li avahiya xwe panel li dar xist. Parlamenterê HDP'ê Huseyîn Kaçmaz mijara di qada hiqûqî de tecrîd nirxand û destnîşan kir ku di hiqûqê de tecrîd sûcê mirovahiyê ye û wiha axivî: "Di destûra bingehîn de mafê her girtiyekî heye ku bi malbata xwe re hevdîtinên telefonê bike. Her wiha mafê her girtiyekî ye ku bi parêzerê xwe re hevdîtinê bike. Îro tecrîd ne tenê li Îmraliyê heye, li her deverên Tirkiyeyê heye."

## 7 girtiyan xwest biçin girtîgeha Îmraliyê

7 girtiyên li Girtîgeha Tîpa T a Şirnexê, xwestin biçin Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Girava Îmraliyê. Girtiyan daxwazname dan û sewqa xwe xwestin. Li gorî agahiyên ku parêzerên girtiyan da, girtiyan ji bo sewqî Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Girava Îmraliyê bên kirin daxwazname dane rêveberiya girtîgehê. Girtî Osman Fîdan, Abdulbasrî Ekîcî, Salîh Kutlu, Hakan Kutlu, Abdulkerim Sevînç, Mahsun Guçlu û girtiyekî ku navê wî nehat zanîn, daxwazname dan rêveberiya girtîgehê û sewqa xwe xwestin. Berê jî ji Girtîgeha Tîpa T a Hêjmar 2 a Rihayê 78 girtiyan daxwazname dabûn û xwestibûn biçin Îmraliyê.



# Divê pêşî li otosansurê were girtin

Li gor daneyên Komeleya Rojnamevanan a Dîcle Firatê (DFG), di meha çileyê de li 5 rojnamevanan ceza hatiye birîn, rojnamevanek hatiye girtin, 4 rojnamevan hatine binçavkirin û 6 rojnamevan jî bi êrîşan re rû bi rû mane û 30 nûçe jî hatine astengkirin. Li gor rapora meha kanûnê ya komeleyê jî 960 nûçe û 145 malperên nûçeyan hatine astengkirin.

Nivîskarê rojnameya Birgunê Erk Acerer û sekretera giştî ya Sendîkaya Basin İş Dîskê Ozge Yûrttaş, zext û zoriyên li ser rojnamevanan nirxandin. Erk Acerer anî ziman ku desthilat ji bo ser sûcên ku dike binixumîne sansurê pêk tîne. Acerer, destnîşan kir ku desthilat ji civakê û demokrasiyê dûr ketiye.

Sekretera giştî ya Basin Îşê Ozge Yûrttaş jî destnîşan kir ku li Tirkiyeyê rojnamevan tenê ne bi sansurê, bi otosansurê re jî rû bi rû ne. Yûrttaş, anî ziman ku divê pêşî li ber vê otosansura di çapemeniyê de bê girtin û ji bo vê têkoşîneke xurt divê. Yûrttaş got: "Ji bo neasayîkirina vê rewşê, ev pir girîng e. Li hemberî sansurê û zextan, bertekdayîneke xurt pir girîng e." ***STENBOL***

HELBESTA KURDÎ XWE LI SER LINGAN GIRTIYE

# Ziman gencîneya dîroka gelan e

Rizoyê Xerzî

*Me vê carê jî berê xwe da bajarê êvînê Qamişloyê û der barê helbest, ziman, êş, bîranîn û jiyana evîndarekî helbesta kurdî, bi helbestkar Dildarê Aştî re hevpeyvînek kir. Aştî ji salên 90'î heta niha bênavber hespê hest û dilîniyên xwe di vê qadê de dibezîne.*

**Dildarê delal, bi rastî jî wekî dibêjin sal wekî sîleyan in, gelekî zû derbas dibin. Bi texmîna min cara dawî me 20 sal berê hevdu dît. Ez dixwazim tu bi kurtasî behsa rewşa niha ya helbesta kurdî ya li Rojava bikî û bi helbesta salên 90'î re bidî ber hev?**

Bi rastî sal bi lez derbas bûn, di nav zehmetiya pêkanîna pêwîstiyên jiyanê de, di nav karûbar û pêdiviyên rojane de, di nav melav û hewildana afirandinê de, xewinandin û kedkirinek bo nivîsandina helbesteke bi nûjentirîn şêwe bihête nîşan û dirûvkirin ...

Bi saya keda helbestvanên ji salên heştêyan ên sedsala borî, helbesta kurdî û bi taybetî ya nûjen, dikarîbû ji zikêşkê xwe tenatena bigire heta salên 90'î û niha xwe li piya û li ser lingan girtiye û navin baş di vê pêvajoyê de cih girtine.

Lê helbesta kurdî li Rojava bi şêweyê klasîkî, helbesta Cegerxwîn derbas nekiriye û ên ku li Cizîrî jî vedigerin ji xwe dûrî wê asta hunerî, ciwanî û felsefî ya Cizîrî ne.

Helbesta nûjen hino hino alavên xwe yên helbestî nû û peyda dike. Wê dikarîbû bi hezaran peyvên jibîrbûyî di pêvajoyeke helbestî de bi kar bîne, di wateyeke nû de vejîne, wêneyên helbestî bafirîne, rîtim û şêwazeke ciyawaz pêşkêş bike...

Bi tevahî hîna gelek pirsgirêk û alozî hene ku deq û heyberê helbestî jê digazine. Weke tevna helbestî, dereng hatina wateyê, dirêjkirina nepêwîst a hevoka helbestî, nerewabûn û liherikbûna zimanê helbestî, kêmezmûna bikaranîna peyvê ji bo dahênana wateyên durû û peyhevhatina û daşopandina demî a tîpan û rîtmên dengînî û hwd.

**Piştî ewqas gavên hêja di warê perwerde û avakirina dibistan û zanîngehên kurdî de, em dîsa dibînin ku li ser malperên civakî piraniya ciwanan zimanê erebî bi kar tînin, gelo sedem çi ye?**

Ev bixwe mijareke gelek girîng e, bersiva wê ne hesan e û pêdivî bi lêkolîneke dûr û kûr heye. Bi hacetî lêvegerîn û şopandina serbor û tecrûbe û dîroka miletên hempa ye. Ev pirsgirêkeke siyasî ya bingehîn e, bo gelên ku bindestî dîtine û zimanê wan derfeta xwe bo pêşketin û nûjenkirinê nestandine...

Duzimanî yan pirzimanî, bêguman derfetin civakî yên fireh li ber mirov vedike, lê pirsgirêkên wê jî hene. Bandora wê li ser pêkhatina derûnî û çandî ya mirovan pir e, digihê astekê ku mirov hestiyar dibe ku du kesayetan di hundirê kesekî de dijîne. Mirov bêhtir dikare derûna xwe, hestên xwe, bi zimanekî bêhtir ji yê din derbibire. Her zimanek aliyekî ji kesayetiya mirov diyar dike. Wisa jî yek ji erkên ziman dezgeha têgihiştin û hevgihiştin û danûstandinê ye. Lewra di welatên pirziman de, her tim zimanê sereke bêhtir derfeta xwe dibîne û bêhtir mirov daxwazên xwe pê bigihînin. Her wisa jî çalakiyên zanînê yên ziman, bi ramandinê ve girêdayî ne û têkiliyeke diyalektîkî di navbera wan de heye; raman di qalibekî zimanî de tên dariştin. Xewn jî bi zimanekî taybet dihêne dîtin. Em dibêjin zimanê dayikê , lê dayika kurd jî ne bi zimanekî kurdî yê rewa û xwerû bi zarokan re dipeyive. Ji xwe hîna zarok piz e, di malzarokê de ye, gelek dengan werdigire û dibe ji pêkhatina wan a derûnî.

Ev bi tevayî, bersiva taybet a pirsa te ye.

Di çarçoveya raman û mijarên borî de, zimanê kurdî nebûye zimanê sûk û bazarên aborî û teknîkî. Ev demek e dîrokî jê re divê, wisa jî çend nifş pêwîst in, da ku serhevdemanek çandî, kultûrî ya naskirin û zanînê çêbibe. Wisa jî, destkeftiyên ku pêk hatine li Rojava hîn temenê wan kin e. Berhem û derencamên wê di demeke pêş de bên diyarkirin. Tevî ku xwendevanên zimanê kurdî roj bi roj pir dibin û dest pê kirine carcaran di berhemên cur bi cur de diyar dibin.

Serbarî vê tevî jî, sedemên siyasî bi xurtî himberiyê dikin û rewşenbîrên kurd dixwazin dengê doza xwe bigihînin firehtirîn û dûrtirîn cihan.

**Piştî êrîşên li ser herêmê gelek kesan ji deverê koç kirin û di heman demê de gelek kesan ji deverên din koçî bajarên kurdan kirin. Vê yekê bi xwe re çi guhertin, bi taybetî li Qamişlo ji ber ku tu li wir dijiyî?**

Di karesatên mezin de, di bûyer û krîzên aloz de, di cengên navxweyî de, (û ev pesn û rûdêmên rewşa Sûriyeyê bi tevahî ne), gelek mişextî û koçberî çêdibin, ji hin deran ber bi hin deran ve, ji hundir ber bi derve ve...

Vê çi bandor kir?

Welatekî weke Sûriyeyê, ku zihniyet û hişmendiyeke netewperest a teng fermandarî lê dikir û siyasetên ciyawaz û şovînist der barê kurdan û pêkhate û kêmnetewan de dihate bikaranîn û çespandin, weke derencamên vê siyasetê miletên Sûriyeyê ji hev ditirsiyan. Hev nas nedikirin, li ser hev bi kîn bûn. Vê rewşê tevlîbûnek çêkir, naskirinek di nav pêkhateyan de çêkir, bêhtir xelk di warê civakî, çandî û derûnî de nêzîkî hev kirin. Wisa jî biyaniyan bêhtir kurd û doza wan nas kirin. Gelek ji miştextî û koçberên ber bi herêmên kurdî ve hatin, herêm wek cihekî ewle ji xwe re dîtin, lewra kar û barê xwe û gelek pîşe û pîşemendiyên nû bi xwe re anîn van herêmên me.

Lê ji hêleke neyînî ve, weke guhertineke etnografîk çêdike. Hino hino rûdêmên herêmê tên guhertin, li nik guhertinên demografîk li herêmên dagîkirî.

**Ji 80'yî û heta salên 90'î kovarên wêjeyî yên wekî Rojda, Zanîn, Gulîstan hebûn. Niha li Rojava çi kovar û rojnameyên kurdî hene?**

Bi rastî niha çalakiyeke çapemeniya baş fereh tê kirin; gelek rojname û kovar derdikevin. Wisa jî gelek pirtûkên wêjeyî lê bêhtirên wan navrokên wan kevn in û berhemên kevn in û derfeta çapkirin û belavkirinê dîtine.

Cihê mixabiniyê ye ku ez mikur bêm û bibêjim pênc yekitiyên nivîskarên kurd hene, ev jî nahêle yan dibe kelemek bo çêkirina tevgereke wêjeyî û aferînî. Her wisa jî çêkirina tevgereke rexneyî ku afirîneriyan bişopîne.

**Dildar ez dizanim ku ji beriya salên 90'î tu helbestan dinivîsî, lê tevî ewqas sal berhemên te yên çapbûyî gelek kêm in. Ne şaş bim tenê pirtûkek te hatiye çapkirin, sedem çi ye?**

Rast e, tenê berhemeke helbestî çap bûye, berê me nexwest zû bi zû em çap bikin, piştî me xwest çap bikin derfet kêm bûn. Niha di baweriya min de, derfet heye min xwe vala nedîtiye, bi hêvî me ji niha û bi şûn de wê dest bi çapkirinê bibe. Niha derdora heft berheman amade ne. Tevahiya wan helbest û berhemek ji wan taybet bo zaroka ne, ango helbestên zarokan e.

**Helbesta te ya herî şîrîn li ber dilê te kîjan e, yan jî tu dixwazî kîjan helbesta xwe diyarî xwînerên rojnameya me bikî?**

Bi rastî ev bijarteyek zor e. Helbesta ku ez jê hez dikim hîn min nenivîsandiye. Tevî çend helbestên min di pêşbirkên berfireh de xelata yekemîniyê girtine, lê dîsa dikarim çend helbestan diyarî bikim. Hêvî dikim ku xwînerên rojnameyê pê dilxweş bibin.

**Her wiha peyama te ji bo xwîneran çi ye?**

Li nik dawaxwaziya mirov bo wergirtin û bidestxistina firehtirîn zanîn û naskirinê, zimanê gelan nasnameya wan e, ciyawaziya wan e, rola wan ya şaristaniyê di dîroka mirovatiyê de diyar dike. Gencîneya zanîn û dîrok, raborî û paşeroja wan e. Bi zimanê dayikê mirov dikare bêhtir hest û agah, bêrî û xewnên xwe veguhêze, helwesta xwe ya mirovî derbibire. Zimanê xwe biparêzin, pê bixwînin û binivîsin, nemaze di warê wêje û aferînî de, helbestên xwe, çîrok, şano, pexşan û romanên xwe. Hewil bidin ku hûn zimanekî rexneyî têr têgeh û zarava peyda bikin. Grûp û navendan saz bikin, ji bo tevgereke wêjeyî û rexneyî bi hev re kar bikin, tekoşînê bidomînin.

Dawî ez dixwazim bi çend helbestan xatirê xwe ji te û xwînerên rojnameyê bixwazim.



Mixabin hîn jî zimanê kurdî nebûye zimanê sûk û bazarên aborî û teknîkî. Ev demeke dîrokî jê re divê. Her wisa jî çend nifş pêwîst in, da ku serhevdemanek çandî, kultûrî, ya naskirin û zanînê çêbibe. Destkeftiyên ku li Rojava pêk hatine hîn temenê wan kin e

***Hişkolekî***

*Peyvên te*
*ji higivtinê hilû bûne*
*ji destên te dişemitin*
*nav xîmava diruşman...*
*bê elend wate dibûrin*
*bê rengên bûyerê wêne derbas dibin*
*ramanên te*
*nabin ferişt û perî*
*hişkolekî digindirin*
*li ber gav û simên kerî!!...*

*22/1/2021*

***Dariştin***

*Helbestvano!*
*Piştî vê kêferatê*
*Piştî vê bobelatê*
*Te çi got û çi pêk anî ?!*
*Xewnerojên jar*
*Li baxan nebûn mêvan*
*Xoşxewanên xavî bêzar*
*Li qêrîna mişextan nebûn sîwan...*
*kî li qêrîna hejaran dişênije?*
*kî li şewata helbestvanan dipêjine?*
*tenê em temenê xwe dipûrisînin*
*di hûçikên şevê de*
*sawîran diguhêzin*
*metirsî hiş dikevêjin*
*ceng tiliyên şanîdanê dibirêjin*
*emê çawa*
*nameya xwe bi hûrbînî bidarêjin?!...*

*21/1/2021*

***Neşewitîne!***

*Bi debengiya pesindanê*
*Bavê xwe neşewitîne*
*Min ji nêz ve ew nas dikir*
*Bê quloç bû*
*Ne gayê yarîgehan bû*
*Ne piling bû dizûriya*
*Ne baz bû digeriya*
*Dilê wî çivîkeke bê ziyan bû*
*Bi mizgînî*
*Bax bi bax difiriya!...*

*5/4/2020*



## Dildarê Aştî kî ye?

Di 25'ê cotmeha sala 1966'an de, li gundê 'Navkurê' yê bi bajarê Qamişlo ve girêdayî, hatiye dinyayê. Lê di dosyayên fermî de, jidayikbûna wî 1969 hatiye qeydkirin. Li bajarê Qamişlo dijî û ji qurbaniyên serjimêriya 1962'yan e. Destpêkê bi zimanê kurdî, bi kêşesazî helbest nivîsandine. Di nîvê salên 80'yî de, dest bi helbesta nûjen dike. Dîwanek wî ya bi navê 'Were vê êşa bilind' hatiye çapkirin.

# Roja zimanê zikmakî pîroz be

Navenda Nûçeyan

Bi boneya 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê, em der barê rêyên çareserkirina pirsgirêkên zimanê kurdî bi lêkoler Ibrahîm Seydo Aydogan, mamosteyê zimanê kurdî Samî Tan, nivîskar Ronayî Onen û endamê TZÇK'ê Bawer Berşev re axivîn

Wekî tê zanîn Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO), ji bo balê bikşîne ser zimanan, hikûmet rêz û hurmetê ji zimanan re nîşan bidin û dewlemendiya zimanan biparêze di 1999'an de 21'ê Sibatê wekî Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê îlan kir û ji wê salê vir ve tê pîrozkirin.

Di 21'ê Sibata 1950'yan de, ji ber ku dewleta Pakistanê li ser axa bengaliyan zimanê bengalî qedexe dike, xwendekarên zanîngehê ev rewş protesto dikin. Li hemberî vê protestoyê polîsên Pakistanê êrîşî xwendekaran dikin û di encama bûyerê de gelek xwendekar jiyana xwe ji dest didin.

Her wiha li gorî daneyên rêxistina navneteweyî ya UNESCO'yê, her sal bi dehên zimanan ji ser rûyê cîhanê winda dibin û tên jibîrkirin. Bêguman ev talûke li ser zimanê kurdî jî heye û bi taybetî li bakurê Kurdistanê.



Ibrahîm Seydo Aydogan

Bi munasebeta 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê, em der barê rewşa zimanê kurdî ya heyî û rêyên çarserkirina pirsgirêkên zimên bi lêkoler û mamosteyê zimanê kurdî Ibrahîm Seydo Aydogan, nivîskar û mamosteyê zimanê kurdî Samî Tan, nivîskar û mamosteyê zimanê kurdî Ronayî Onen û endamê sekreteryaya Tora Ziman û Çanda Kurdî Bawer Berşev re axivîn.



Samî Tan

**Zarok êdî bi kurdî nizanin**

Têkildarî vê mijarê Mamoste Ibrahîm Seydo Aydogan bi boneya roja zimanê zikmakî wiha bersiva me da û got: "Zimanê ku nebe zimanê birêveberiyê, nebe zimanê perwerdeyê, nebe zimanê bazirganî û civakê, nikare zêdetirî 50 salan bijî. Kurdiya Bakur, ji ber nebûna dibistanan li dûrî sîstema serdest mabû, lê belê van 40 salên dawîn, êdî ket ber diranên pişaftinê. Em rastiyê ji hevdu re bibêjin: Li Amedê jî û li Colemêrgê jî nifşên nû êdî kurdî weke zimanê duyem dibînin, lê zarokên wan êdî bi kurdî nizanin û ew pê napeyivin. Desthilatdariya siyasî tekane rêya çareseriyê ye li hember mirina zimanê kurdî li Bakur. Binêrin, li Başûr û li Rojava, ev pirsgirêk êdî nîne, sedem ew e ku ziman bûye yê birêveberiyê".

Seydo ji bo gavên çareseriyê jî ev pêşniyar kirin û wiha got : "Ez behsa Bakur dikim, lewre li parçeyên din rewş cuda ye. Ji bo ku mirov zimanekî mîna kurdî tercîh bike, divê sedemên mirov hebin, weke motîvasyonên siyasî, weke îstîhdama kar, weke neçarî. Di salên 80'yî de, li Bakur, bi tenê gundî û koçer bi kurdî dipeyivîn. Lê îroj kurdî zimanê elîtan e, rewşenbîrên kurd xwe bi kurdî îfade dikin; lê li kolanê kes pê napeyive. Ji ber ku xema jiyanê, ji xema siyasî xurttir e. Sedema duyem îstîhdam e. Bînin bîra xwe, kesên ku qet xwe li vî zimanî nedikirin xwedî hebûn, gava fêm kirin ku dikarin bi kurdî di televizyonan de bixebitin, vegeriyan ser kurdî. Lê ekla wê kêm e. Kurdiyeke etaheyato çawa lê hato ye, ji xwendin û ruhê zimanî gelekî dûr e. Gava ez lê guhdarî dikim ulsera min tev radibe. Îcar em rastiyê bibêjin: ji bo ku zimanê me wenda nebe, divê kurdî bibe zimanê fermî. Heger na, heta 50 salên din êdî kes pê napeyive. Oto-asîmîlasyon jî vê demê kurttir dike. Mala Xwedê ava ku hêvî hîn jî heye û li Başûr û Rojava, milkê kurdî xwe xurttir dike."

**Hemû qadan bikin jîngeha ziman**

Mamoste Samî Tan jî der barê rewşa ziman de nêrînên xwe anîn ziman û wiha got: "Rewşa zimanê kurdî li bakurê Kurdistanê, bi taybetî jî li bajaran, dişibe rewşa mirovekî gelekî westîyayî ku xwe bi darê zorê li ser pêyan digire. Îro zimanê kurdî di bin desthilatiya komara tirk de ji hemû derfetên pêşketinê bêpar hatiye hiştin, axêverên wî bi her cure pest û pêkutiyê ra rû bi rû mane. Di van mercên giran de li aliyekî zimên hêza xwe ya derbirînê roj bi roj ji dest daye, li aliyê din axêverên wî zimanî her roj kêmtir dibin. Zimanê ku me berê wekî zimanê dayikê û zimanê zikmakî bi nav dikir, êdî dibe zimanê dapîr û bapîran. Xebatên rapirsînê yên dawîn nîşan didin ku roj bi roj qad li zimanê kurdî teng dibe.

Ligel van mercên giran jî zimanê nivîskî bi pêş dikeve, hejmara kesên bi vî zimanî dinivîsin û dixwînin li gorî berê zêdetir dibe, lê hejmara mirovên ku vî zimanî wekî navgîneke ragihandinê, di jiyana xwe de bi awayekî suriştî bi kar tînin kêm dibe. Tiştê herî xerab jî nifşên hînî vî zimanî nabin, hejmareke pir kêm a xemxurên zimanê kurdî hewl didin ku zarokên xwe bi kurdî mezin bikin, lê belê mercên heyî karê wan pir dijwar dike. Zarokên wan malbatan, ji ber nebûna jîngehên suriştî yên xwerû bi kurdî, ji bo wergirtina zimanê kurdî bi qasî ku têra wan bike, dûçarî axaftina bi zimanê kurdî nabin. Ji ber duçarbûna kêm zarok nikarin bi awayekî suriştî zimên wergirin, digel hemû hewldanan jî ew zarok zimanekî qels û şikestî werdigirin. Heke wiha bidome, piştî çend deh salên din dê hejmara axêverên kurdî dakeve rêjeyeke pir kêm û dê çand û nasnameya kurdî jî di asteke pir marjînal de were temsîlkirin.

Ji bo rewşa ku me li jorê qalê kir, biguhere serê pêşîn divê zimanê kurdî bibe xwedanê statûyeke fermî û zimanê perwerdeyê. Kurd divê biryarekê bidin, gelo ew bi rastî dixwazin wekî kurd bijîn? Heke vî tiştî dixwazin, divê têkoşîna parastin û bipêşvekirina zimanê kurdî li her cihî û warî derxin pêş, li aliyekî xebata bidestxistina mafên ziman bikin, bi hişmendiyeke xurt li zimanê xwe xwedî derkevin, ji bo pûçkirina polîtîkayên pişaftin û xwepişaftinê xwe birêxistin bikin, hemû qadên jiyanê bikin jîngeha zimanê xwe, nehêlin ku ev stêrka geş a esmanê welatê wan bixurice."

**Çareyek mayînde lazim e**

Endamê sekreteryaya Tora Ziman û Çanda Kurdî (TZÇK) Bawer Berşev jî bi vê boneyê ji rojnameya me re nêrînên xwe wiha anîn ziman: "Zimanê me ne li ber sekeratê be jî nêzî wê yê. Bi taybetî kirmanckî. Bo kurmancî em vê nikarin bêjin. Ji ber ku bêhtir hem kurmanc pir in hem jî mixabin kurmancî bûye zimanê yekem. Celadet ne kurmanc bûya ger kirmanc bûya îhtimal e niha rewş berevajî bû.

Her wiha bo her du zaravayên mirov dikare vê bêje, axaftin her diçe kêm dibe lê xwendin zêdetir dibe. Xwînerên kurdî zêde dibin.

Zimanê me winda nabe ew merhele çû. Ji ber ku êdî bûye nivîskî. Bi sedsalan neyê axaftin jî ku rojek dewletek an jî statûyek avabû em ê bikaribin wî zimanî dîsa zindî bikin. Lê ji bo ku em bixwazin kurdî bibe zimanê bazarê li ber hemû civata kurd du rê hene. A yekem statûyek a duyem jî divê teqez di dibistanan de bi zimanê kurdî perwerde were dayîn. Ji xeynî van çareyên din ne çareyên mayînde ne."

**Divê em xebatên heyî zêdetir bikin**

Mamoste Ronayî Onen jî bi boneya roja zimanê zikmakî ev nirxandin kir û got ku divê xebatên heyî werin zêdekirin û xurtkirin. Onen nêrînên xwe yên der barê vê mijarê de wiha anî ziman:



Ronayî Onen

"Ji bo bersiva vê pirsê bi awayekî zanistî bê dayîn, pêdiviya me bi xebatên qadî heye. Divê em xebatên heyî zêdetir bikin da ku ji rewşa zimanê kurdî baştir fêm bikin. Lê dema mirov bala xwe dide çend xebatên heyî jî mirov tabloya xerab a rewşa zimên dibîne. Li gorî lêkolîna qadî ya ji aliyê SAMER'ê (Navenda Lêkolînên Sosyo Polîtîk ên Qadê) ve hatiye kirin di navbera nifşan de veguhastina zimên her diçe kêm dibe. Li gorî lêkolînê ji %74'ê kurdên temenê wan di ser 65'î re, di nav malê de bi kurdî diaxivin, lê ev rêje ji bo kurdên temenê wan di navbera 18-24'an de dadikeve ji %68an. Dibe ku ev wekî rêjeyeke biçûk xuya bibe lê ne wisa ye, wendabûna zimên a di navbera nifşan de nîşan dide. Dîsa li gorî heman lêkolînê ji %76'ê kurdên ku ne xwende ne di nav mala xwe de bi kurdî diaxivin, bes ev rêje di nav kurdên lîsans qedandine de dikeve ji %61'î. Dema mirov li ser hejmara xwendeyan a bilind dibe bifikire, ne zehmet e ku mirov tê derxe bi vê bilindbûnê ka dê bikaranîna zimanê kurdî çi qas kêmtir bibe."



Bawer Berşev

**Rewşa zimên a kambax**

Onen di berdewama axaftina xwe de behsa rewşa axaftina bi zimên kir û wiha got. "Li gorî lêkolîna qadî ya Navenda Lêkolînê ya Rawestê ji %48'ê kurdên ku pirs li wan hatine kirin, bi dê û bavê xwe re bi kurdî diaxivin bes ji %13'ê wan bi zarokên xwe re bi kurdî diaxivin. Ango ji nifşê duyem ji her du kesan yek bi dê û bavê xwe re bi kurdî diaxive, bes di nifşê sêyem de ev rêje (kêm zêde) dikeve ji dehan yekê. Li gorî lêkolînê veguhastina zimên a ji nifşê duyem bo nifşê sêyem kêm dibe. Bi ser de jî ji çar kesan yek ji bo zarokên wan hînî kurdî bibin hewl nadin.

Ev xebat rewşa zimên a kambax derdixin holê. Lîteratur nîşan dide ku zimanên derbasî nifşên nû nebin, bi xetereya wendabûnê re rû bi rû ne. Belê zimanê Kurdî hêj li ser koka xwe şîn tê bes xetere mezin e.


Heger mirov ji aliyê aktîvîzma zimên ve binirxîne dîsa rewş ne zêde baş e. Ez aktîvîzma zimên wisa terîf dikim: hemû pêketinên bo vesazkirina jor-siyaseta zimên ku li hember siyaseta asîmîlatîf a dewletan siyaseteke nû pêşniyar dikin an jî hemû hewldanên bo vejîna zimanên bi xeteraya wendabûnê re rû bi rû mane. Dema mirov li beriya sala 2015'an dinêre aktîvîzmeke xurt li qada gelemperî xwe nîşan dide. Lê niha ji bilî hewldanên ferdî, komî an jî sazûmanî yên bisînor mirov nikare qala aktîvîzmeke xurt bike".

Jor-sîyeseta asîmîlatîf her roj bi roj bi hemû sazî û dezgehên xwe zimanê kurdî zêdetir dihêrîne, di rewşa heyî de zehmet e ku zimanê kurdî li ber xwe bide.

**Pêdivî bi aktîvîzmeke taybet heye**

Der barê çawaniya berxwedana li hemberî aşê asîmîlasyonê jî mamoste Ronahî Onen vê yekê wiha anî ziman: "Ji bo berxwedana li hember vê çerxê di serî de pêdivî bi aktîvîzmeke ji jêr ve heye; aktîvîzmeke ku mijara zimanê kurdî dike rojeva xwe ya bingehîn. Divê ev aktîvîzm qadên sivîl ên berxwedanê veke û zimên di wan qadan de vejîne. Ji aliyekî bo xitimandina siyeseta zimên a heyî tevbigere ji alîkî jî bo parastina zimên xebatên qadî bimeşîne.

Ji bo xitimandina pergalê wekî mînak ku bi hezaran dê û bav ji bo dersa bijarî ya kurdî serî li dibistanan bide, dibe ku ev yek dengekî vede. Ji bo parastina zimanê kurdî xebatên zanistî yên wekî avakirina lîteratura qadên cihê divê zêdetir bibin. Ji bo hişmendiya zimên di nav gel de bi taybetî di nav dê û bavên ciwan de berbelavtir bibe divê nexşerêyeke vê aktîvîzmê hebe. Lewre niha girîngtirîn tişt ew e ku dê û bavên ciwan ên kurd di girîngiya zimên de bigihîjin. Helbet di dawiyê de mirov divê binê vê rastiyê jî xêz bike ev hewldan dê encax bikaribe temenê zimanê kurdî dirêjtir bike û piştê bidê ku li ber xwe bide. Lewre lîteratur nîşan dide, zimanên nebin zimanê perwerde û rêveberiyê her û her bi xetereya wendabûnê re rû bi rû ne."



# 'Armanc dagirkirina Kerkûk û tevahiya Başûr e'

Navenda Nûçeyan

**Akademisyenê başûrî Dr. Hawjîn Mela Emîn têkildarî êrîşa Garê û hevkariya PDK'ê ya bi Tirkiyeyê re axivî û diyar kir ku armanca Tirkiyeyê dagirkirina Kerkûk û tevahiya başûrê Kurdistanê ye**

Ev salek e ku PDK ji bo hêzên xwe yên leşkerî li qadên wek Zînê Wertê, Garê, Ranya-Rewandûz, Dînartê Sorçiyan (Akrê) û hwd. de bicih bike her tim di nav hewldanekî de bû. Bi vê yekê ve girêdayî di meha mijdarê de li Çemanka ya herêma Garê, hêzên taybet yên PDK'ê xwestibûn ku li dijî kampên gerîlayên PKK'ê operasyonê pêk bînin. Daxwaziya PDK'ê ya dorpêçkirina qadên gerîlayên PKK'ê roj bi roj bi pratîkên dijminatiyê bi berdewam kirin.



PDK bi van polîtîkayên xwe yên li dijî yekitiyê bi Tirkiyeyê re her diçe hevkariya xwe hê sexlemtir dike. Tirkiye pişta xwe dide vê hevkariya PDK'ê û êrîşên xwe zêdetir dike. Herî dawî artêşa tirk bi alîkariya PDK'ê di 10'ê sibatê de ji bo dagirkirina herêma Garê dest bi êrîşeke berfireh kir. HPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên dagirker ji bakûrê Kurdistanê nehatine, ji aliyê Başûr ve êrîş kirine û şer li gundê Siyanê destpê kiriye.

**Li başûr gel bertek nîşan da**

Piştî êrîşa Tirkiyeyê bi sedan welatiyên bajarê Silêmaniyê li dijî êrîşa Tirkiyeyê û hevkariya PDK'ê meşiyan. Welatiyan ji parlamentoya Herêmê û Parlamentoya Iraqê daxwaza helwestê kir. Li gel vê yekê jî nivîskar û hunermendên başûrê Kurdistanê êrişên Tirkiyeyê yên li ser xaka başûrê Kurdistanê şermezar kirin û peyama 'divê kurd tev bi hev re li dijî êrîşên Tirkiyeyê bisekinin.' dan.

Têkildarî mijarê Akademîsyen û çalakvanê sivîl ê başûrî Dr. Hawjîn Mela Emîn ji rojnama me re axivî. Dr. Hawjîn dest nîşan kir ku armanca Tirkiyeyê dagirkirina axa başûr e.

**'Herêm di destê PDK'ê de ye'**

Dr. Hawjîn M. Emîn di axaftina xwe de diyar kir ku di rastiya êrîşên Tirkiyeyê de tunekirina destkeftiyên her sê perçeyên Kurdistanê hene û wiha got: "Di rastiya xwe de şerê Tirkiyeyê li dijîtevgera azadiyê, gelê Kurdistan û bi taybet her sê perçeyên Kurdistanê bi hevkariya Partiyê Demokratî Kurdistan bi rê ve diçe. Ev yek li hemberî yekitî, rizgarbûn û li hember armancên stratejîk ên gelê kurd xisareke mezin çê dike. Ev jî dibe sedema ku destkeftiyên salan ji destan herin. Ev xiyaneteke mezin e li hember gelê kurd. Bi taybet jî li hemberî tecrûbeya başûrê Kurdistanê. PDK li başûr li herêmên xwe serdest e û van herêman kontrol dike. Lê ev kiryarên PDK dibin sedem ku gelê kurd destkeftiyên xwe yên başûr jî winda bike. Em baş dizanin ku sedema van êrîşên Tirkiyeyê yên li ser herêmên medyayê, herêmên azadkirî yên başûrê Kurdistanê û Rojava ne, bi tenê têkbirina PKK'ê ye. Armanca Tirkiyeyê ew e ku başûrê Kurdistanê jî dagir bike. Bi vê yekê dixwaze gelê Şengalê jî têk bibe. Her wiha armanc ew e ku Kerkûk û tevahiya başûrê Kurdistanê dagir bike. Em vê hevkariya PDK'ê ya li gel Tirkiyeyê ya dagirker wek metirsiyeke mezin dibînin. Ew li dijî tevahiya xebatên rizgarî û azadiyê yên gelê kurd e."

**'Li gorî berjewendiyan tevdigere'**

Akademisyen Mela Emîn dest nîşan kir ku sedemên hevkariya PDK'ê yên bi Tirkiyeyê re ji paşeroja polîtîkayên berê yên PDK'ê tê û ev tişt anî ziman: "Sedema têkiliyên PDK'ê yên bi Tirkiyeyê re ew e ku li gor berjewendiyên xwe yên malbatî û partîtî ne û her wiha dixwazin li başûr wek desthilateke mayînde bimîne. Bi taybetî dixwaze petrol û dewlemendiyên Başûr ji xwe re bi kar bîne. Peywendiyên PDK'ê bi Tirkiyeyê re êdî derfet nehiştiye ku careke din PDK li eniya niştimanî ya kurdî vegere. Nikare dev ji van têkiliyan berde. Mixabin berjewendiyên xwe di van têkiliyan de dibîne û helbet ev berjewendî jî li dijî berjewendiyên gelê kurd ên dirokî ne û her wiha li hember berjewendiyên statûya gelê kurd in. PDK bi heman şêwazê li gor polîtîkayên Tirkiyeyê tevdigere. Ji bo vê yekê jî hem tecrûbeyên Rojava hem jî yên PKK'ê ji bo xwe wek metirsiyê dibîne."

**Serdana Akar**

Dr. Hawjîn Mela Emîn bal kişand ser serdana wezîrê parastinê yê Tirkiyeyê Hûlûsî Akar û diyar kir ku têkiliya wî bi van êrîşan re heye û wiha domand: "Beriya Akar, Fîdan jî serdana Hewlêrê kiribû. jixwe piştî serdanê jî di demek kurt de êrîşên Tirkiyeyê hem li Rojava hem li Şengalê û niha jî li Garê dest pê kir. Yanî bi kurtasî di armanca serdanê de razîkirina dewleta Iraqê û PDK'ê hebû. Tirkiyeyê ji Bexda û Hewlerê xwestin ku dema ew êrîş bikin, li hember vê yekê bêdeng bimînin. Ev çend roj in Tirkiye êrîş dike dîsa jî deng ne ji Bexdayê û ne jî ji Hewlerê derneketiye."

**Êdî kurd yekitiyê dixwazin**

Akademisyen Dr. Hawjîn Mela Emîn dest nîşan kir û got dê gelê kurd bi tu awayî van êrîşan qebûl neke û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Gelê kurd li Başûr piştî êrîşên Tirkiyeyê li hember hevkarî û nokeriya PDK'ê jî derketin qadan. Êdî kurd yekitiyê dixwazin, ji bilî vê tu tişteki din qebûl nake. Ji bo vê yekê jî hewce ye PDK dawî li hevkariya xwe ya bi Tirkiyeyê re bîne."



## Tirkiye peymanê bin pê dike

Serokê Lijneya Parastin û Ewlekariyê ya Parlamentoya Iraqê Mehemed Rîda El-Heyder derbarê êrîşên dagirkeriya Tirkiyeyê de ji televizyona El-Sumeriye re axivî.Mehemed Rîda El-Heyder bibîr xist ku sala 2008'an di navbera Iraq û Tirkiyeyê de li ser mijara ewlekariyê peymanek hatiye îmzekirin û li gorî vê peymanê destur hatiye dayîn ku artêşa Tirk ji bo 2 hefteyan karibe derbasî nav xaka Iraqê bibe. Rîda El-Heyder destnîşan kir ku dewleta Tirk ev peyman binpê kiriye û niha dest bi dagirkirina xaka Iraqê kiriye. El-Heyder da zanîn ku artêşa Tirk li seranserî sînor herêmek zêdetirî 17 kîlometre dagir kiriye. El-Heyder têkildarî dagirkirina herêmek 17 kîlometreyî zanyariyên berfirehtir nedan, lê li gorî daxuyaniyên rayedarên Herêma Kurdistanê û nûçeyên ku beriya niha di çapemeniyê de hatine weşandin, artêşa Tirk a dagirker nêzî 40 kîlometreyan ketiya nav axa Başûrê Kurdistanê.***BEXDA***



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Navê tunekirina kurdan: 15'ê Sibatê

Li seranserî Kurdistanê gelê Kurd û dostên xwe di 22. salvegera komploya Navneteweyî ya li dijî rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li ser pêyane. Tişta ku çalakiyên îsal ji yên salê borî cûda dike îdîa û têkoşîna îradeya azad e.

Li welat û derveyî welat her kes têkoşîna li dijî êşkenceya li Îmraliyê û sîstema tecrîdê weke têkoşîna xwe, weke şertê jiyana demokratîk û azad dibîne û xwedî lê derkeve. Bi her şêweyên çalakiyan hişmendî û siyaseta komployê tê darizandin û tê mehkûmkirin. Gelê kurd nîşan dide ew naxwaze bi komployê re bijî.

Tevahiya êrişên komploger ên li dijî Ocalan pêşdikevin di bingeha xwe de êrişên li ser felsefe û jiyana azad ya Ocalan pênaseya wê dike ye. Bi van êrişan ve hewildin ku îradeya jiyana azad ji holê rakin. 22 sal in li ser vê bingehê êrişê dibin ser Rêber Apo.

Komploya navneteweyî beriya her tiştî êrişeke topyekûn a navneteweyî ya ji bo tunekirina gelê Kurd bû. Her kes bi vê rastiyê baş zane, ku yê biryar ji bo komployê da, plan kir û pêk anî rêveberiya DYE'yê bû. Li ser bingeha îmze û fermana Serokê DYE'yê yê wê demê Clînton komplo pêk hat. Bêguman DYE'yê dema biryareke wiha da, herî zêde ji Îngilistan û Îsraîlê hêz û piştgirî wergirt.

Armanca komployê tunekirin bû. Beriya her tiştî bi rê û rêbazên komploger hewl dan îmha bikin û weke rewşeke nediyar nîşan bidin. Ji ber ku bi ser nexistin xwestin ku bi komployê Rêber Apo bi dewleta Tirk bide îdamkirin. Piştî ku ev jî hate pûçkirin hingê sîstema tecrîd û êşkenceyê afirandin û bi polîtîkaya rizandinê xwestin ku Ocalan ji aliyê îdeolojîk û siyasî ve têk bibin.

Dema ku ev jî hate têkbirin, êdî desthilatdariya AKP-MHP'ê ya heyî ji bo vî karî hate wezîfedarkirin. Hemû hewildan û daxwaza wan ew bû ku piştgiriya civaka Kurd a ji bo Ocalan û PKK'ê lawaz bikin. Lewma dest bi êrişên xwe yên provokatîf-tasfiyekar kirin.

Dewleta Tirkiyeyê van êrişên xwe bi piştgiriya DYE û NATO'yê dimeşîne. Komploya navneteweyî bi vî rengî li ser bingeha konsepta tasfiye û tunekirinê dewam dikin. Bi rengê îdeolojîk, leşkerî, siyasî û aborî, bi her awayî tê meşandin. Bêyî ku guh bidin pîvanên hiqûqî û exlaqî bi her rê û rêbazê êriş dikin.

Em zanin ku stratejiya komploya navneteweyî bi vî rengî hate afirandin. Armanca yekane îmhakirina Ocalan bû. Bi wê ve xwestin PKK'ê tasfiye bikin. Bi tasfiyekirina PKK'ê ve jî qirkirina Kurdan a sed salan dewam bikin. bi ser bixînin! Yanî ji aliyê cewherî ve êrişeke qirkirinê ye. Qirkirina gelê Kurd e.

Komploya navneteweyî êrişa ji bo dewamkirina qirkirina Kurdan e. Li ser vê bingehê li dijî çareseriya pirsgirêka Kurd e. Li dijî hebûn û azadiya Kurdan e, hewldanek ji bo astengkirina çareseriya siyasî û demokratîk a pirsgirêka Kurd e.

Pêwîste hemû Kurd vê baş bizanibin ku komploya 15'ê Sibatê di kesayeta Rêber Apo de îradeya azadî û hebûna Kurdan kir hedef. Sekn û helwesta afirîner û bi dîsîplîn, rêxistinbûyî, têgihiştî ya Rêber Apo, polîtîkaya tecrîdê ya Îmraliyê, êrişên tasfiyekar provokatîf û lîstikên AKP-MHP'ê têk bir.

Ya rast bi komployê xwestin ku di nava rojekê de Rêber Apo îmha bikin. Lê bûye 22 sal, hîn bi ser neketine. Yên ku komploya 15'ê Sibatê kirin, plana wê kirin dixwestin di nava şeş mehan de Tevgera Azadiya Kurdistanê tasfiye bikin.

Şoreşa Azadiya Kurdistanê li ser rêya serketinê bi pêş ve dibe. Ev têkoşîn ji sînorên Kurdistanê derbas kir, veguherand tevgera demokrasî û azadiyê ya global. Îro ji Îngilistanê, Îtalyayê, Misir û Efrîkayê sendîqa, sazî û kesayetên navdar bi armanca xwedîderketina fikrên Rêber Apo li ser piyane û doza azadiya wî ya fizîkî dikin.

Her ku planek hate pûçkirin planên nû amade kirin û bi vî rengî êrişên komploger ên ji bo temamkirina qirkirina Kurdan dewam dikin. Êrişên heyî li ser vê bingehê tên kirin. Tevî ku têkoşîneke dîrokî hate meşandin. Êrişên li ser herêmên parastina medya, Şengal û Rojavayê Kurdistanê pêş dikevin jî ji nêz ve bi vê komployê re girêdayî ne.

Belê armanc û planên komployê hatine qelskirin, hatine pûçkirin, lê belê eşkere ye ku komplo bi temamî nehatiye têkbirin. Hêzên komploger niha bi van hewildanan dixwazin gava duyem ya komployê têxin dewrê ew jî bi tamamî tasfîye û qirkirina Kurda ye. Pêwîste hemû Kurd û partiyên Kurdistanî vê baş bizanibin ku ev plan hemû Kurda digire nav xwe û wê ji bo Kurdan ji jenosîdê jî xirabtir be.

Li ser vê bingehê di salvegera komploya 15'ê Sibatê de divê gelê Kurd bi hamû derfetên xwe hîn xurtir li ser rastiya komployê rawestin. Encax bi vî rengî dikarin li dijî komployê têkoşîneke bi bandor, serketî û encamgir bimeşînin.

## NY’ê li ser zêdebûna xetereya DAIŞ’ê hişyar kir

Li gorî rojnameya Ereb Newsê ya Erebistana Siûdî, Meclisa Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ragihand ku xetereya DAIŞ`ê li ser aştî û ewlehiya navneteweyî zêde bûye û hewl dide xwe birêxistin bike.

Serokê Nivîsgeha Têkoşîna li dijî Terorê ya Neteweyên Yekbûyî (UNCOT) Vladimir Voronkov da zanîn ku DAIŞ bi rêya înternetê xwe digihîne ciwanan û fikrên tundrew di nav wan de belav dike û bi bîr xist ku tevgera DAIŞ’ê ji ber sedema koronayê her kes li mala xwe asê maye, ev saleke xwe ji nû ve birêxistin kiriye.

Serokê UNCOT’ê Voronkov diyar kir ku her çiqas DAIŞ ‘xîlafeta’ xwe li Iraq û Sûriyeyê ji dest dabe jî lê hîn li her du welatan êrîşan pêk tîne û dibe ku îsal jî li gelek deverên cîhanê êrîşên din pêk bîne. Her wiha Voronkov hişyar kir ku dê DAIŞ ji nû ve xwe birêxistin dike da û wiha got: “Ji ber ku DAIŞ piraniya demên xwe li ser înternetê xerc dike, bi vî awayî gelek kesan birêxistin kiriye. Lewre bi sivikbûna tedbîrên xweparastinê yên koronayê re dibê ku rêzeêrîş li dijî gelek dewletan pêk bînin.”

Di berdewama axaftina xwe de Voronkov piştrast kir ku derdora hezar DAIŞ’î ku piraniya wan iraqî ne, ji bo demeke dirêj li ber xwe bidin, xwe di nav şaneyên biçûk de bi rêxistin dikin û li çolistan û gundewarên Sûriye û Iraqê xwe vedişêrin.

Der barê rewşa kampên Hol û Rojê de yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Voronkov banga sekreterê giştî yê NY’ê Antonio Guterres ji tevahiya dewletên endam re dubare kir ku berpirsiyariyên xwe bi cih bînin û hemwelatiyên xwe yên li kampan vegerînin.

Balyozê Amerîkayê yê meclisê Geoffrey DeLaurentis der barê rewşa kampan de destnîşan kir ku gelek dewlet qebûl nakin hemwelatiyên xwe ji wan kampan vegerînin, lê bi vê ve girêdayî xetereya DAIŞ’ê dê mezintir bibe.

Nûnerê Rûsyayê yê NY’ê Vasily Nebenzia jî têkildarî mijarê wiha got: “Mixabin dewletên endam vê dozê paşguh dikin. Yekitiya Rûsyayê bi awayekî cidî di vî warî de bi Sûriye û Iraqê re hevkar e.” ***CENEVRE***

# Li herêmên dagirkirî perwerdeya tirkirinê

|| Navenda Nûçeyan

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê piştî ku hin herêm hatin dagirkirin, demografiya van herêman jî hat guhertin. Bi hezaran komên girêdayî Tirkiyeyê li van herêman hatin bicihkirin. Di van salên borî de ev yek bi dehan raporan jî hat tespîtkirin ku Tirkiye li herêmên Sûriyeyê siyaseta tirkkirinê dimeşîne. Herî dawî di 6’ê sibatê de serokomarê Tirkiyeyê Erdogan biryara dabû ku li bajarokê Rayî yê girêdayî parêzgeha Helebê ya bakurê Suriyeyê fakulteyeke bijîşkiyê û peymangeheke zanistên tenduristiyê dê bê vekirin.

Li ser van gotinên Erdogan, endamê desteya hevserokatiyê yê PYD’ê Aldar Xelîl li ser hesabê xwe yê Facebookê wiha gotibû: “Biryara Erdogan a ji bo vekirina fakulteyên li Rayiyê yên girêdayî zanîngeha Stenbolê dayî, piştrast dike ku ew van herêman wekî herêmên Tirkiyeyê dibîne û li wir qanûnên Tirkiyeyê dimeşîne. Li van herêmên dagirkirî yên Sûriyeyê materyalên Tirkiyeyê li dibistanan dide. Ev yek jî piştrast dike ku li kêleka aliyê siyasî û leşkerî, qirkirina çandî û ferzkirina çanda Tirkiyeyê jî dewam dike. Pêwîst e mêjî, fikir û wijdana hemû welatiyên Sûriyeyê yên bi welatê xwe ve girêdayî, hişyar be.”



Siyasetmedar Semîr Ezam têkildarî polîtikayên tirkirinê yên Tirkiyeyê ku li herêmên dagirkirî pêk tîne, diyar kir ku Tirkiye bingeha ku herêmên Rojava tev li axa xwe bike, amade dike



**Perwerde û fakulteyên tirkirinê**

Siyastmedar Semîr Ezam têkildarî ferzkirina tirkbûnê û biryara vekirina fakulteyan axivî û wiha got: “Vekirina peymangeh û fakulteyên perwerdeyê yên li herêmên dagirkirî, di çarçoveya plana tirkirinê de ye ku dewleta tirk bi awayekî berfireh dimeşîne. Ji hildana ala Tirkiyeyê ya li ser avahiyên fermî, dibistan û nexweşxaneyan bigire heta vekirina dergehên bejahî yên di navbera bajarên dagirkirî û axa Tirkiyeyê de jî li gor plana tirkirinê tevdigere.”

**Armanc pêşeroj e**

Semîr Ezam her wiha da zanîn ku Tirkiye şêniyên xwecihî ji bajar û bajarokên wan dide koçberkirin û li şûna wan kesên biyanî bi cih dike û pereyên Tirkiyeyê ferz dike. Semîr Ezam der barê vê yekê de jî wiha got: “Tirkiye bi armanca pêşeroja xwe ya ku jî bo van herêmên tev li axa xwe bike, tevdigere. Ev ne pêşbînî ye, ji serokomarê Tirkiyeyê heta wezîrê parastinê û wezîrê karên hundir ên Tirkiyeyê gelek caran ragihandin ku Heleb, Idlib, Efrîn û bajarên din ên Rojava her wiha bajarên Tilefer, Mûsil û Kerkûk li gorî Mîsak-î Milî herêmên Tirkiyeyê ne. Yanî zemîna ku van herêmên tev li axa Tirkiyeyê bikin, tê avakirin.”

**‘Divê gel dengê xwe bilind bike’**

Siyasetmedarê ji Sûriyeyê Semîr Ezam da zanîn ku divê welatiyên Sûriyeyê têbigihîjin wê yekê ku Tirkiye dijminê hemû etnîk û gelên li Sûriyeyê ne û wiha lê zêde kir: “Divê gelê Sûriyeyê bi hemû pêkhateyên xwe, li hemû herêman dengê xwe bilind bikin û bi çekan û lênûsan li hemberî hişmendiya dagirkeriyê li ber xwe bidin, da ku karesata tevlêkirina herêma Arkiya ji Kilikyayê re (1992) û Lîwa Iskenderun (1939) dubare nebe.”

**Binpêkirina peymanan**

Semîr Ezam di axaftina xwe de destnîşan kir ku bêyî erêkirina her du aliyên garantorên Astanayê (Rûsya û Îran) û lihevkirina wan a aşkerea û veşartî Tirkiyeyê nikarîbû artêşa xwe derbasî Cerablus, Bab û Idlibê bike, herêmên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir bike û li wan herêman sûcên şer ên sûcên qirkirina etnîkî pêk bîne.

Ezam da zanîn ku şerê ku Tirkiye û komên girêdayî wê pêk dikin binpêkirina Peymana Cenevre 4’an û ya Peymana Romayê ye, lê li gel bêdengiya civaka navneteweyî û Netewên Yekbûyî vî şerî dikin.

**Banga piştgiriyê**

Siyasetmedar Semîr Ezam di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku tenê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) li Efrîn, Serekaniyê û Girê Spî li dijî dagirkeriya Tirkiyeyê, komên girêdayî wê û DAIŞ’ê li ber xwe dane û bang li azadîxwaz û welatparêzên Sûriyeyê kir ku herî kêm di aliyê siyasî û ragihandinê de piştgiriyê bidin HSD’ê.



Destar

Ehmed Pelda

# Dewleta serî qûç, binî pûç

Bi rastî Tirkiye welatekî balkêş e. Balkêş e ku ew çîroka "Yaşar ne yaşar ne yaşamaz" (Yaşar ne heye, ne tune ye) encax li vî welatî diqewime. Lêbelê bêhtir çîrok hene ku hê jî berdewam in.

Wekî nimûne erebe heye motor û parçe nîn in. Balafira bêmirov heye dûrbîn û motor nîn in. Tank û helîkopter hene motora pê bişixulin nîn e. Rêber û serwer wek malxweyî bazariyê dike û mizgîniya derxistin û firotanê dike, lê gaz û petrol nîn e. Sê alî derya ye, lê dorpêçkirî ye. Êrîşî her welatî dike lê cihekî xwe lê ragire nîn e. Xaniyê mezin, avahiyên terikî û bê hed û bê hesab hene, lê karxane û kargeh nîn in. Xwedî xwezayeke bêhempa ye, bi çiya û banî û deştên xwe bêsînor e, lê ji bo berhemên sewalvanî û çandiniyê hewceyî derve ye. Welatekî demokrat e, lê ji xêncî tirkbûnê kesî qebûl nake. Welatekî dîndar e, terîqet, şêx, mele bê sînor in, lê diz, talanker, zordar û mafya pîroz in. Welatê turîzmê ye, lê cihûwarê gerûgeştê bûne qurbana rantê. Li gor hin statîstîkan welatekî zengîn e, lê deynê bêhesab li ser welêt barê giran e. Ji bo sermayeya navneteweyî hemû tawîzan didin ku hin pere bînin û derfetên kar vekin, lê sermayedar, serwer û bîrewer pereyê welêt dişêlînin û dibin welatên din. Dixwin û diqirpînin.

Lê niha jî, ango di fînalê de berê xwe dane esman û hîvê. Li vî welatê ku ji birçîna însan nêz dikevin û dimirin an jî ji ber bêçaretiyê xwe dikujin, serwer û rêber xeyalên sed saliya komarê bi peymên çûyîna fezayê pîroz dikin. Ji bo vê jî ji senaryoyên erzan jî şerm nakin. Monolîtekê ku li gor emsalên xwê bê qelîte, li warê Girê Mirazan, bi nivîseke bûye sembola nijadperestiyê li welatê kurdan diçikînin û pê re jî peyama xwe ya mizgîniya çûyîna li ser hîvê pêşkêş dikin. Bo vê jî derketine parsa rûsan ku hela ka di dûmahîkê de çi fenûfût dê derkevin.

Em dikarin der barê hiş û mentiqa dewleta tirk de gelek tiştan bibêjin û hemû jî neçarî nîqaşan in. Lê tiştek heye ku bê şik û şiphe tirk dikin û xwe pê serbilind dibînin. Dijminahiya netewa kurd, belê wek dewlet, wek civak, wek kes ev mijar bi xwe re kirine rik. Wan konê hebûna xwe li ser kîndarî û xwîndariya kurdan ava kiriye.

Ne henek be, lê wisa tê xuyakirin ku ev meseleya çuyîna fezayê jî bi kurdan re girêdayî ye. Tê zanîn, ev dewlet bi her kesî re, her miletî û dewletî re her bazariyê dike, dide û distîne. Her tawîzê jî dide, lêbelê ev hemû jî, ji bo kurd negihîjin mirazê xwe.

Wisa aşkera ye ku ji bo Rûsyayê razî bikin, wekî li herêmên Rojava û deverên Kurdistanê yên cuda tawîzan bigirin, mecbûr in bertîlê bidin Rûsyayê. Tê zanîn mijara S-400'an jî wiha qewimî. Dîsa îhaleyên saziyên nukleerê jî girtin. Bi vê sayê Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî dagirkirin. Li Idlibê temenê serdestiya xwe û çeteyên xwe dirêj dikin.

Belkî di encemê de tirkek biçe fezayê, çend fotoyan pêşkêş bike û pesnê Erdogan û Mistefa Kemal bide. Ala Tirkiyeyê jî derxîne û maç bike. Lê gelo di rastiyê de wê ev çi çareser bike? Wek nimûne gelo kurd, êdî wê xwe û îradeya xwe radestî tirkan bikin? Gelo deynê Tirkiyeyê wê biqede? Mimkûn e ku Tirkiye bibe welatekî fezayî û ji bo vê jî gelo derfet hene?

Mixabin tu tiştek jî çareser nabe. Ev hişê kêmgirtî heyanî ji Rûmeliyê heyanî Anatolyayê, ji Kilîkyayê heyanî Pontusê yan jî ji Zagrosan heyanî Mezrabotan ango seranserê Kurdistanê wê çi biguhere? Ji xeynî rîtuelên sedsala berê wê çi biguhere?

Belê serî qûç e û binî puç e! Lê kesên wê qûç dibînin jî ne kêm in. Bi taybetî li ba me, yên xweziya xwe bi qûçî tînin bi pişopişokirina serdestan sermest dibin, di bin giraniya qûçî de jî diminîn û pûç dibin.

Lazim e em hay ji xwe hebin.

# Zarokên nîvziman û berkendal!

Cemîl Guneş

**Heke zimanek bibe zimanê perwerdeyê rê li ber pêşketina wî gelî vedibe û ziman jî heta cihekî ji mirinê xelas dibe. Her wiha bi wê perwerdeyê mirov dikare pêdiviyên civaka xwe bîne cih û ziman û çanda xwe veguhezîne ji bo nifşên nû. Ji ber ku ev daxwaz bi cih nehatiye encamên trajîk jî derketine holê**

Yek ji rojeva sereke ya me kurdan ji sed salî zêdetir in perwerdeya bi zimanê zikmakî ye. Ji ber giringiya mijarê ev daxwaz û nîqaşên li ser mijarê her tim hebûye. Sîyaset, îdeolojî, bîr û baweriya me her çi be jî me dev ji vê daxwaza xwe bernedaye û bêguman em ê ji niha şûn de jî dev jê bernedin. Sedem jî ew e ku gelek aliyên perwerdeya bi zimanê zikmakî heye. Ji pedagojiyê bigirin heta aboriyê û ji siyasetê bigirin heta ehlaqê, ji çandê bigirin heta hebûna neteweyî... Mixabin çi qas di rojeva me kurdan jî de be, heta niha ev daxwaz bi cih nehatiye. Wek ku me got ev daxwaza heq û xwezayî bi deh salan e bi cih nehatiye, êdî bûye tevgerek û pê re jî dozek. Gelekî trajîk e ku mirov doza tiştekî aîdî xwe bike. Êdî ew rewşa trajîk di ser re çûye û ji bo ku em vî tiştê xwezayî bi serdestên xwe bidin qebûlkirin, em lêkolînan dikin, em diqîrin, dikin hawar û derdê xwe ji saziyên sivîl re dibêjin ku piştgiriyê bidin me û doza me. Bêguman heke zimanek bibe zimanê perwerdeyê rê li ber pêşketina wî gelî vedibe û ziman jî heta cihekî ji mirinê xelas dibe. Her wiha bi wê perwerdeyê mirov dikare pêdiviyên civaka xwe bîne cih û ziman û çanda xwe veguhezîne ji bo nifşên nû. Ji ber ku ev daxwaz bi cih nehatiye encamên gelekî trajîk jî derketine holê. Wek encam; axaftina kurdî roj bi roj kêm dibe, statuya kurdî ya di nav kurdan de pir xerab dibe, pirtûkên kurdî nayên xwendin û problemeke adaptasyonê derdikeve holê.

Kêmbûna axaftina kurdî civaka xwe ji çand û hunera xwe dûr dixe. Hin peyv û gotin wenda dibin. Folklora kurdî derbeke mezin dixwe. Tecrûbeyên bavûkalan venaguhêze ji bo nifşên nû. Ji aliyê siyasî ve qutbûnên mezin çêdibin... Mirov dikare bi dehan mînakan bidin. Lê encamên herî trajîk jî li dibistanan rû didin. Zarokên kurdan ji nav derdoreke kurdî bi carekê ve tev li jiyaneke tirkî dibin. Ne bi zimanê xwe lê bi zimanekî din dest bi perwerdeyê dikin. Mixabin ev zarok ne ji bo amadekirina civakê, ji bo têkbirina çand, ziman û hunera civaka xwe tên perwerdekirin. Ji bo ku perwerde bi awayekî serkeftî derbas bibe hewce ye ku bi zimanê civakê perwerde bê kirin. Lê ji ber ku ev daxwazên xwezayî bi cih nayên li dibistanan zarokên me bi sedan pirsgirêkan re rû bi rû dimînin. Wexta ku qala pirsgirêkên zarokan ên dibistanê dibe, kesên mezin dibêjin di wexta me de jî wisa bû loma em dizanin çawa ye û mezin bibin zarok dê li xwe hay bibin. Ez tev li vê fikrê nabim çunkî di destê me de gelek çavdêrî û lêkolînên xurt hene ku vê fikrê piştrast nakin ango niha û berê ne yek in. Çunkî berê, axaftina kurdî zêdetir bû, jiyan zêdetir kurdewar bû û gelek kesên temenmezin û jêhatî hebûn ku çîrok ji me re digotin ku bîreke me ya xurt çêdibû. Teknolojî ew qas bi pêş ve neçûbû û bandora xwe ew qas li me nedikir. Jiyana me, xeyalên me bi rastiyên me re têkildar bûn. Dibe ku mînak û bûyer bişibin hev lê mixabin encamên perwerdeya niha xerabtir e.

Zarok ji aliyê xwendin, nivîsîn, axaftin, guhdarkirin, afirandin, derûnî û ji aliyê serkeftina akademîk ve derbên giran dixwin. Nikarin bixwînin, bixwînin jî fêm nakin, nikarin derdên xwe bibêjin, pir kêm tiştmane ku kêfa xwe pê bînin. Ne hînî zimanê xwe dibin, ne jî hînî zimanê dibistanê dibin. Xwe xerîb hîs dikin, tenê dimînin. Ev hemû dibin hêrs di dilê wan de. Lê ev hêrsa wan êdî ne li hember dibistanê ye, ev hêrsa wan li hember malbatê mezin dibe. Çunkî difikirin ku malbat wan avêtine nav agirekî û di ser re jî agir gur dikin. Jixwe cudahiya duh û ya îro herî zêde li vir zelal dibe. Hêrsa li hember pergalê, bûye hêrsa li hember zimanê xwe. Êdî zarok ji zimanê xwe fedî dike û wenda ye!

Ez ê vê nivîsê bi çîrokekê bi dawî bikim. Piştî vê çîrokê şîroveyan jî nakim û êdî em wicdanên xwe. Belkî ne çîrok lê qîrînek e, belkî jî gazî ye. Min gelek çîrokên bi vî rengî bihîst di wexta lêkolîna xwe de ji mamosteyan. Ev ji wan yek e. Ev zarok 7 salî ye hîn nû dest bi dibistanê kirîye.




**Qêrînek**

Zarokek di wexta bêhnvedanê de li ber deriyê pola xwe nobedê digire ku ji hevalên wî kes nekeve polê. Cihê ew pol lê ye jî mamosteyek nobedar e û qaşo çavên wî li ser zarokan e ku tiştek bi serê wan neyê. Ev mamoste ji wî zarokê ku li ber derî sekiniye û diqîre ku ew zarok jî dakeve jêr û li ber derî nesekine. Lê zarok deng nade wî mamosteyî. Mamoste careke din wî hişyar dike ku dakeve jêr lê zarok dîsa jî bi mamoste dikene û tev nalive. Mamoste hêrs dibe û nêzî wî xwendekarî dibe, li ser wî zarokî diqîre û dibêje "ma tu ker î û min fêm nakî?". Wexta ku zarok fêm dike ku mamoste hêrs bûye serê xwe bera ber xwe dide û deng nake. Wexta ku zarok serê xwe bera ber xwe dide mamoste sîleyekê li ser çavê wî zarokî dide. Wexta ku sîle lêxist ez çûm cem wan. Min got bê ka mesele çi ye. Mamoste derdê xwe got lê zarok dîsa bêdeng ma. Ez bi zarok re kurdî peyivîm û min got çi bûye? Zarok got; "Nizanim dengê wî dihat, min fêm nekir got çi, hat û li min xist". Min fêm kir ku zarok bi tirkî nizane. Min ji mamoste re got zarok bi tirkî nizane loma ji te fêm nekiriye. Mamoste xwe wek xemgînbûyî nîşan da û ji wî zarokî re got li qisûra min nenêre û çû. Ew zarok ji wê rojê şûn de nehat dibistanê. Çend roj şûn de çûm mala wan da ku pirsa wî bikim. Diya wî û çend xwişk û bira rûniştibûn. Tiştê ku min ji diya wî bihîst hundirê min şewitand. Zarok ji malê re ev gotine; "Ez careke din naçim wê dibistanê, ka kiyê min li wê derê heye. Ez ji wan fêm nakim, ew ji min fêm nakin. Hevalên min henekê xwe bi min dikin, bi min dikenin." Piştî van gotinan ez matmayî mam. Min jî got zorê nedin wî heta ku hinekî baş bibe. Diya zarok jî got, em qarişî wî nadin çend roj in çunkî êdî lawê min bi me jî pev diçin û dewam kir; "Dibêje hûn jî vî zimanî bi min re nepeyivin, ez ji we jî behecîme. Heke hûn bi vî zimanî bi min re nepeyiviyana mamoste li min nedixist."

# Kapîtalîzma dorpêçdar: Xefika nû ya dewleta kûr



Kurdistan Lezgiyeva

Kapîtalîzma dorpêçdar yek ji wan gelek teoriyên bûrjûwa yên “refaha giştî” ye ku xwedan diravê cîhanê bi periyodîk di demên dijwar de civakê didin xwarin, hewl didin ku ji daxwaza şerkirina mafên siyasî dûr bixin.

Kapîtalîzm di krîzê de ye, ew westiyaye. Wekî Soros got. "Êdî muzîk tune ye, lê ew hemû govend digirin."

Pirsgirêka berfirehkirina xizaniyê bi vejîna ramanên çepgir, heya Marksîzm û Lenînîzmê, ku jixwe di derdorên rewşenbîr û xwendekar ên rojava de tê dîtin, tehdît dike. Divê rojev were şopandin, lê ji bo ku prensîba hêza serdest a malbat û klanan neguhere.

Kapîtalîzma dorpêçdar, bi rengek nû ya tifaqa di navbera bûrjûwaziya mezin û serê dêra katolîk de, ku bi derdorên darayî yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Brîtanyayê re bûye yek, demagojiyek kevn e.

Di despêka sedsala XX de, Vatîkan bi ramana hevkariyê û hevgirtinê ve hatibû pêçandin, hewl dida ku teoriya wê demê ya populer a Marksîst a tekoşîna çînayetiyê di civaka pîşesaziyê de bibîne, lê piştî ku korporatîzm ji hêla faşîzma îtalî ve hate pejirandin, ku bû hevalbendê Hîtler, raman bi teoriya amerîkî ya kapîtalîzma gelêrî, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn re populer bû, hat guhertin.

Ew mîna projeyek dij-fuhuşê bû ku ji her jinekê “xwedî berpirsiyariya civakî kêm” dihat xwestin ku makîneyek dirûnê bikire.

Di şûna makîneya dirûnê de, ji proleterya hat xwestin ku pariyên pargîdaniyan di mîqdarên biçûk de bide, da ku ew bikaribin beşdarî kapîtalîzmê bibin û berjewendiyên çînê biguherînin. Rast e, mîqdara dabeşên salane ew qas hindik bû ku mirov dikare wan bi kar bîne ku carek ji bo kirînên biçûk biçin firoşgehê. Ji ber vê yekê, proleterya ku ji hêla xizaniya nisbî ve dihat cudakirin, hewl da ku di zûtirîn dem de parveyan bifroşe, lê ramana xwe neguherand û ji ber vê yekê raman hat terikandin.

Serdema serfiraziya gelemperî ya çîna navîn mumkun bû ku bi çareserkirina nakokiyan re mijûl nebin, ji ber ku ew ji hêla leza krediyê ve hatin vemirandin. Dema ku ew xilas bû û bazar ketin krîzek din a zêde hilberînê, qezencên pargîdaniyê dest pê kirin. Teqandina gurzên darayî yên li ser borsayan bû sedema feqîrbûn û zuwabûna çîna navîn a bilez ku bi spekulasyona borsayê rû bi rû ma, wan dîsa kapîtalîzma mirovan bi bîr xist. Lê niha wan di forma sergirtî "dorpêçdar" de navek din lê kir.

Pêdivî ye ku dema peyvek nayê famkirin, girse rêz lê bigire û îdiayên qayîmbûn û rastdariya zanistî rewa bike hin tişt bên guherandin. "Dorpêçdar" dikare wekî gerdûnîbûnê were wergerandin - mînak peyva "jêhatîbûnê"- berovajiyê vê gotinê bi taybetî li ser bê sekinandin.


Kapîtalîzma dorpêçdar wekî teorî tê vê wateyê ku civakbûna civakê berfireh dibe, lê ne dewlet li navendê xuya dike, lê pargîdaniyek, bêguman, transnetewe û ne celebek din. Yê ku dewletê radike û karên wê yên birêkûpêk taybetî dike ew e. Heger hin misoger bikin, em ne qala pargîdaniyan dikin, lê qala xwedan bankên ku wan fînanse dikin, ku hikûmeta cîhanê wekî polîtburoya cîhanî ya wek di mînaka Partiya Komunîst a Yekitiya Soviyetê de, rêxistina giştî ya cîhanî ava dikin.

Wekî ku hûn jî dibînin, îdeolojîstên kapîtalîzma dorpêçdar pirsgirêka mirovahiyê ya kedê wekî kategoriyek hebûna civakî û jiyana madî ya civakê bi tevahî paşguh dikin. Ew ne ji hêla ontolojîkî, ne ji hêla epîstemolojîk ve, ne jî bi metodolojîk nikarin wê çareser bikin. Lê bêyî vê yekê, pirsgirêka ji holê rakirina xizaniyê di prensîbê de çareser nabe.

Dibe ku Marx qebûl nekin, lê wê hingê hewceyî pê bibînin ku tiştek cuda, nexasim wek felsefeya civakî -bingehpêşniyar bikin, ev statu ye ku teoriya kapîtalîzma niha tê de îdia dike.

Derxistina pirsgirêka kedê her lêgerîna li rêyek derketina ji pirsgirêka civakî bi zanistî bêwate dike, çi dibe bila bibe sosyalîzma bêedeb an jî ne kêmî wê kapîtalîzma bêedeb. Dewlemendiya civakekê ne li ser sermaye, lê li ser kedê ava dibe. Teoriya kapîtalîzma gerdûnî dikare wekî propagandaya banal a desteserkirina hêza ramyarî ji dewletan ji hêla celebek darayî ya neteweyî ve were hesibandin.

Hewldanek li dijî vê konseptê li dijî projeya çînî ya "kapîtalîzma rêxistinbûyî ya komunîst" an jî li dijî "kapîtalîzma dewletparêz a celebek nû" ya rûsî dibe ku bibe bingehek ji bo şerekî propagandayê ya dirêj, lê divê mirov jê hêviya serfiraziyek rastîn neke. Berî her tiştî, ji ber ku kes bi rastî ya ku hatî îlankirin bi cih nayne. Di bingeha kapîtalîzmê de ne pirsgirêka qenciya hevpar, lê pirsgirêka hêzê ye. Lê hêz, wekî ku hûn jî dizanin, berovajiyê diravî, nayê parvekirin.





Dewey Ma
Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## Çerçî

Etar yan zî çerçî, karsazê serdemê yê. Ê ke tewr zehf tûtî çim ro rey înan bî, helbet pîrekî zî. Ca ca bûkî zî. Bêrê ma ewro verê xo bidê ê çerçîyan.

Serr û zeman verî, muhîm nîyo kam cû tarîxe de, la çîyo muhîm, erê, verî çerçî bîbî. Zey ewro dikanî, marketê pîlî helbet çinê bî. Çerçî bîbî û ê çerçî dew bi dew, mezra bi mezra geyrayêne û çende çiyê tedir rotêne.

Zehf serran verî, ê çerçî bi heranê xo geyrayêne. Barê xo kerdêne sindoqan û ê sindoqan eştêne serê paştîya heranê xo û yallah... Dew bi dew...

Tutan veyndayêne: "Çerçîyo barê to çi yo, çerçîyo barê to çi yo"...

Tutan benîşt ra hes kerdêne. Hîvey benîştî bî. Mewican ra zî hezkerdêne.

Pîrekî zî hîveyê derzînî, la û çîyanê anayînan bî.

Reyna zehf verî bî û helbet a çaxî pere çinêbî. Çerçîyan çî xo bi çî dewican terampe kerdêne. Yanê ê çîke dayêne dewican, mesela derzînî dayêne, mewicî dayêne, dewican zî qeybî heqê cê mesela rûno teze dayêne, qawirme dayêne, çi zana, hendî a dewe de çi bîbî, çi meşhûr bî ew dayêne. Cuye bi eno tewir dewam kerdêne.


Dima ra erebeyî veciyayê. Çerçîyê ke îmkanê înan bîbî kar kerd pîl û erebeyan girotî. Na reye bi erebeyan çerçîtî kerd. Na reye tewir bi tewr çî kerdêne erebeyê xo û rotêne.

Mesela caw rotêne, cawê qey başna, doşek, lihêf, cawê qey cilan, qey fistanan, qey cilanê bûkanîyan... Her tewir caw. Çerçîyê ke bi heranê xo rojêk de encax eşkayêne şorê dewêke, di dewan. Çerçîyê neweyî bi erebeyanê xo biwaştê eşkayêne şorê çende dewan. Hendî kar heno bîn rehet bî. Xalê dadê mi zî jo ê çerçîyan ra bî. Verî heminan erebe girot bî û dest bi çerçîtîyo modern kerd bî. Dima ra sebî? Dima ra ê dewe de dikan kerd a û çerçîtîya ê qedîya.

Zehf tay, rewşa çerçîyanê bînan zî ana bî. Heniyan dikan kerd a, heniyan semedê dikanê biyê a mecbûr mendî fek çerçîtî ra vera bidê. Hendî dewan de zî dikan û qehwexaneyî bîbî, cawo ke dikanî çinêbî zî hendî ê şîne sûke û ewca ra lazimatîyanê xo temîn kerdêne.

Ger şima vacê ene mesela çiya ra vecîya? Ez vacî:

Çende roje verî Ajansê Mezepotomya de xeberêke bi sernameyê "Bi roj çerçî, şewe niştox o" vecîya. Zehf kêfê mi a xebera ra hame. Xebera serê niştox Çetîn Lodî de bî. Lodî hema zî çerçîtî keno. Bi erebeyê xo, şino cayan, geyreno, çiyan roşeno û helbet hîkayeyan dano pêser. Lodî heta enka 6 kitabî nişto û niştişê xo dewam keno. Bi xêrê ê rê çerçîtî reyna hame ma vîr. Erê "Çerçîyo barê to çi yo?" Çetîn Lodî belkî qeybî çerçîtî nifşo peyîn o. Çerçîtî zî hendî qedêna. Ma silaman heme çerçîyanê ke heta ewro ked dayê şarî rê şirawenê.





# Hekarî û Zeyneme

Turabî Kîşîn

Hîrê birayî benê. Ê jû di lakî xo benê, namê xo kî Hekarî û Bedran beno. Ê birayê bînî hîrê lacê xo benê, namê xo kî Hemed, Memed û Ûsif beno. Ê bîrayê qikî kî jû kêna xo bena, namê xo kî Zeyneme bena.

Rocê êna pîyê Zeyneme û pîyê Hekarî û Bedranî ênê kiştene.

Ap nî domanan ro xêr nêkeno. Nêkî hetê apê xo de nevindenê, hîrmîna jû keye de manenê. Xorê gîyan danê pîya wenê.

Maneno benê pîl, benê xort. Hekarî zerî keno kêna apê xo Zeyneme. Lacê apê bînî Hemed kî zerî keno Zeyneme.

Anê Hekarî û Zeyneme pîya nîşan kenê pede vanê "Zeyneme nîşanlîya Hekarî'ya."

Na Zeyneme pê hesîna ke Hem rehet nêvindeno. Dima dek û dolaban o. Rocê qayt kena ke Hem û çend hevalê xo serê raya hênîyî de dizdî dizdî qesî kenê.

Na bîroş gêna verba hênîyî şona. Nêzdîyê nînan bena lingan kena giran. Qayt kena ke lacê apê Hakarî hanîko hevalanê xo de qesî keno vano "Bêrê mi de alîkarîye bikê ma Hakarî bikişîme. Eke Hekarî bimiro o çax Zeyneme mecbûr mi gêna."

Mecbûr mi gêna... Zeyneme êna kêde lornena dana xora berbena. Hekarî ra nêvana. Hekarî kî gayt keno ke çend rojîyo ke Zeyneme bêkêfa. Xo be xo vano "Nîşan ra natêrîyo kefê Zeyneme çîno. Gelo zerîya naye mi de çîn a çî yo? Gelo derdê de naye esto çiko?

Ano xo zerede dano we û Zeyneme ra pêyîno.

Hakarî qayt keno ke hanîka berbena û lorika xo de vana "Lawê apê mi Hekarî/Tu bi çît û bi hengalî/ Tirsa min ew tirse ku/Lawê apê mi Hemo te bikuje/Mi xwera bibe bike bermalî.

Ebe lorike cirê berbena vana. No Hekarî zaf baqil beno. Xo be xo vano 'Vilahî naye çîyê heşnayo.

Şono hetê birayê xo Bedranî vano "Bira bê ma ewro Zeyneme bigîme îta ra şime dewêde bîne."

Bedran vano "Qeyî bira to henî va?"

Hekarî vano ez ewro ama keye, mi dî Zeyneme hanîka berbena û lorika xo de nîya nîya vana.

Vazeno ra şewe destê nîşanlîya xo Zeyneme gêno terba birayê xo Bedranî, zaf şonê şenik şonê. Wazenê ke xo biresnê çîyayê Şengalî.

Zaf şonê şenik şonê, Bedran qefelîno, ebe kilame vano "Hekarî keko bira ez westîyame/Nizanim kû berîya Şengalê kîjan e/Pir dûre an sivik mane."

Hekarî kî vano "Meterse bira zaf nêmendo ma xo resnenîme ci."

Şonê şonê axirî xo resnenê Şengal.

Hem pê hesîno ke şîyê. Mordemanê xo gêno keweno dime. Rêçanê înan ra şonê şonê resenê Şengal. Piro peyînê eke Hekarî keye ra vejîno tewer nê la erzenê vileyê ci û xeneqnenê.

Hetanê ke Zeyneme û Bedran heşarê ci benê Hem û mordemê xo rewra remenê şonê.

Şîn û şîban ra dime cinazaya Hekarî darenê we.

Hîna Zeyneme sarê sîyawa Bedranî ra vana "Mî rê astorê Hekarî zên û gem ke, dangan kî rind bîşêdênê."

Bedran fam keno. Vano "Nê?"

Zeyneme zore zor dana qewûlkerdene. Bedran ano astorê Hekarî cirê zên keno. Gem kî keno fek.

Zeyneme porê xo topê pêserî kena û kena binê şewqê xo. Nişena astorê xo ra û şona.

Şona verê kêberê apê xo û veng dana vana "Hemo bê tewer."

Hem se ke êno tewer Zeyneme vana "Ez zê to ebe bêbextîye kesî nêkişena. Naya ameya eşkera to kişena."

Hem dest erzeno piştîya xo tabanceyê xo anceno. Zeyneme ey ra ver ancena û werteyê çareyê Hemî de nana piro.

Hemî kişena û verê astorê xo çarnena Şengal.

*(Çîmekanî Pakîşa Kîşîn)*
*28 Çele 2020*

## Bimbarekkerdişê Menga Xizirî dewam keno



Menga sibate pêroyê cayanê ke tede elewîyî cuyenê û şaristananê bînan ê Vakurê Kurdîstanî de sey Menga Xizirî yena bimbarekkerdişe. Na menge de pêroyê elewîyî cayê ke tede cuyenê de menga Xizirî bimbarek kenê û rojeyê Xizirî tepişenê. Sewbîna cemê Xizirî yeno çarnayene, loqma yeno vilakerdene, cîran û nasî yenê zîyaretkerdene, dûayî yenê wendene, çilayî yenê tavistene û gulbangî dîyenê. Şubeyê Îzmîrî yê Komeleyanê Elewîyan ya Demokratîkan (DAD) bi vilakerdişê loqmeyan menga Xizîrî bimbarek kerd. Gulbangê loqmeyî Ocaxê Mansur Babayî de hetê Rukîye Hurustan Ana û Pîranê Ocaxê Kureyşanî ra Îsmaîl Alkanî ra bi kirmanckî ame dayene. ***ÎZMÎR***


## Komeleya dêrsimijan ya Bornova loqmeyan vila kerde

Elewîyî nê rojanê ke ma Menga Xizirî ra vîyarenê de loqmeyan vila kenê. Bimbarekkerdişê na menge viristîya pandemî de vîyareno. Komeleya dêrsimijan ya Bornova çarçeweya tedbîranê pandemî de Menga Xizirî bimbarek kerde û loqmeyan vila kerde. Pîrê Ocaxê Kureyşanî Hamza Takmaz dûayê loqmeyî kerd. Pandemî vera loqmeyî paketan de vila bîyî. ***ÎZMÎR***



## Dêrsim de 12 pezkovîyî kişîyayî

Dewa Yukari Oymuca ya qezaya Mazgêrdî ya Dêrsimî de 12 pezkovîyî merde ameyî dîyayene. Nêame zanayene ke nê pezkovîyî hetê kam û çi kesan ra maeyî kiştene. Avukat Bariş Yildirim derheqê babete de serê hesabê xo yê medyaya komelkî de da zanayene ke 12 pezkovîyî merde ameyî dîyayene û do gerre bikerî. ***DÊRSIM***




# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**1-**Mamê Mino mamanî
Ji goşt û hestî ye
Pênc şax û bi destî ye
Sed û yek huner lê ye
Li heywana pê ye
De bêjin ev çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Cêwî ne li kêlek in
Ne goşt in, lê nermik in
Dengan kom dikin
Hûn zanin çi ye?

**3-**Tiştek min heye
Wek stêrkan diçirûske
Deriyê wê wek brûsk e
Rondik davê wek nîsk e
Li ser dileqe brû û bisk e
Ew çi ye gelo?

***Berhevkar: Fergîn Melîk Aykoç***

**Bersivên me ev in:**
**1-** Tiliyên destê mirov **2-** Guh **3-** Çav

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Şîv kêran**
**Paşîv kêran**
**Eza dêran**
**Naxum kêran.**




→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Şîv tirşo**
**Paşîv tirşo**
**Eza xirşo**
**Naxum tirşo.**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev ê çêbibe:
**Şîv qeysî**
**Paşîv qeysî**
**Ezê şemsî**
**Naxum qeysî.**

***Çavkanî: Heciyê Cindî***

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Kortal, cihê ku berê genim û cehê xwe tê de hiltanîn 3. Televîzyoneke kurdî ji yên destpêkê 5. Koma pez 6. Stran an jî gotina ji bo razandina zarokan dihate gotin 7. Ne xerîb, ne biyan 9. Ronahiya çavan 12. Gemar, ava qirêj, ava nezelal 14. Noteke muzîkê 15. Darikê ji bo paqijkirina diranan dihate bikaranîn 17. Mûyên bi çena mêran ve 18. Bersiva neyênî 22. Jinên ku diçûn ba pez ji bo ku şîr bidoşin, navekî jinan

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Beyar, berî 2. Navekî jinan
3. Sewaleke ku ji bo şîr û hiriyê tê xwedîkirin
4. Ji bo 5. Guliyê porê jinan ê hûnandî
7. Xelat, şahiya beriya dawetê
8. Noteke muzîkê
10. Roja ku em tê de
11. Bendeman, umîd
13. Bawerî
14. Kesê ji Dêrikê
16. Wiha, wisa, werê
19. Arvan
20. Perestgeha xiristyanan
21. Rojeke hefteyê
23. Cînavkeke kesane ya di rewşa tewandî de

Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 K | A | 2 Ş | | | | | | 3 K | I | 4 Ş | |
| I | | Î | | | 5 Ş | A | M | Î | | A | |
| 6 N | Ê | R | Î | | Î | | | | | | |
| | | Ê | | | R | | 7 R | I | 8 M | | |
| 9 E | 10 R | Z | A | 11 N | Î | | Ê | | E | | |
| | E | | | A | | | 12 Z | O | R | 13 Î | |
| 14 A | Ş | | | L | | | D | | | S | |
| S | | | 15 D | Î | 16 N | D | A | R | | A | |
| 17 Î | Ş | | | | E | | R | | | 18 L | 19 A |
| M | | | 20 Z | | W | | | 21 Î | | | V |
| A | | 22 F | E | R | A | 23 Ş | Î | N | | | Î |
| N | | | R | | | Û | | | | | |

## Kaşkirina li serê gir

Li gundekî Hezroyê, milîsekî şoreşgeran hebû. Rojekê du şoreşger diçin mala milîs. Baran jî wekî dewê meşkê dibare. Li derî dixin, dayika milîs derî vedike, dinihêre ku şoreşger in.

Dibêje: Wax wax mala min bişewite, de kerem bikin derbas bibin hundir.

Şoreşger dibêjin: Na dayê ka ji kerema xwe re bang li kurê xwe bike. Bila were em ê wî bibînin û em ê herin.

Dayik: Welehî kurê min ne li malê ye, çûye bajêr.

Şoreşger dibêjin ê de baş e. Heke ku êvarê hat jê re bibêje bila were gel me, em ê li ser wê pirsgirêkê hinekî nîqaş bikin û diçin.

Dayik: Pirsgirêkê wekî girekî bilind û nîqaşê jî wekî ku mirov xwe li ser berfê kaş bike fêm dike. Dayik bang li wan dike û dibêje: Kurê min, min fêm nekir bila were ser kîjan girî?

Şoreşger dibêjin: Tu jê re bibêje ew dizane.

Êvarê milîs ji bajêr tê, dayika wî jê re dibêje: Kurê min welehî min tiştekî ne ji te û ne jî ji zilamên te fêm nekir.

Milîs: Dayê çima te ji me tiştekî fêm nekiriye?

Dayik: Kurê min hûn dibînin ku dewlet her roj gundên me xira dike û îşkence li me dikin. De ka îca hûn çi dikin? Vê sibehê heval ji bo te hatin û ji min re gotin heke êvarê kurê te hat, tu ji bîr nekî ha jê re bibêje!

Bila sibê were ser gir. Em ê xwe kaş bikin. De ka eviya kar e ku hûn dikin?

Milîs: Dayê hevalan tiştekî din gotine, lê te şaş fêm kiriye.

Dayik: Na kurê min. Welehî min şaş û maş fêm nekiriye. Wan ji min re çi gotibe, wayê ez jî ji te re dibêjim. Gotin bila were serê gir em ê xwe li wê derê kaş bikin.

Milîs hêrs dibe: Dayê dayê kaşana çi, girê çi? Tu vana ji ku derdixî?

Dayik dibêje: Hebe û tunebe girê sor e. Jixwe girekî dinê jî tune ye. Sibetirê, milîs bi rê dikeve û diçe.

Dayika wî li pey bang dike: Here kurê min here. Welehî hûn bi kaşanê negihîştin tu derekê. Ancax hûn bigihîjin kuça Şilikan. Heke êvarê tu hatî ji kerema xwe re ji min re çend heb şilik jî bîne.

Milîs diçe cem hevalan û ji wan re dibêje: Heval duh we ji diya min re çi gotiye ku ji êvarê de hiş di serê min de nehiştiye.

Heval me ji diya te re got, heke kurê te hat bila were em ê li ser wê pirsgirêkê nîqaş bikin û hew.

Milîs: Ax dayê ji destê te. Te pirsgirêk mezin kir û kir wekî girê sor û me jî xwe li ser kaş kir, em gihîştin kuça Şilikan.

Bi xwedê min yek şilik ji te re neanî. Ku tu ber jî biavêjî.

***Şilik:** Ji malbata încasan e û wekî zeytûna reş e û biçûk e

***Riza Uyar***

# 'Bernameyên TV'an di nav qeyranê de ne'

Bêrîvan Kayi

**Lîstikvana başûrî Sirûşt Cemal têkildarî berhem û rêzefîlmên TV'ên Başûr axivî. Cemal diyar kir ku desthilatdarên Başûr naxwazin civak bi pêş bikeve û got ku Başûr di bin bandora rêzefîlmên Kore, Hindistan û Tirkiyeyê de ye**

Têkiliyên başûrê Kurdistanê yên siyasî yên bi dewletan re, bandora xwe li aborî, çand, huner, bi giştî li gelek aliyên civakê dike. Helbet ev ji bo hemû dewletan wisa ye lê li başûrê welêt hinek taybetmendî û cudahiyên vê têkiliyê hene. Bi taybetî di sektora rêzefîlm û fîlman de, giranî û badora dewleta tirk pir aşkera xuya dibe. Saziyên sivîl û komeleyên Başûr dem bi dem nerazîbûna xwe ji bo vê rewşê nîşan didin.

Lîstikvana ji başûrê Kurdistanê a fîlm û rêzefîlman Sirûşt Cemal der barê rewşa televîzyonên Başûr de ji rojnameya me re axivî. Cemal diyar kir ku Başûr bi giştî di bin bandora rêzefîlmên Kore, Hindistan û Tirkiyeyê de ne.

Sirûşt Cemal têkildarî mijarê da zanîn ku di van salên dawî de ketiye nav qeyranê û wiha got: "Tu pêşketinek an jî aliyekî wê yê nû tune ye. Sedema vê yekê xistina civakê ye. Civak ji her alî ve hatiye xistin. Li ser wêje û hunerê bi kûrahî nayê sekinandin û fikrên afrîner tune ne. Helbet ev yek jî bandorê li jiyana gel û têkiliyên wan ên rojane jî dike. Yanî her çiqas hin tişt hatibin kirin jî niha di hemû aliyên jiyanê de li Başûr paşketinek heye, asta berhemên tên çêkirin pir qels e."

**'Pêşketina civakê naxwazin'**

Cemal diyar kir ku sedema qelsbûna bernameyên televîzyonan desthilatdar û siyasetmedar in û ev tişt anî ziman: "Ji ber ku ev derdor îro naxwazin gel bernameyên baş, cuda û dirust temaşe bikin û pêşiya pêşketina civakê digirin. Dema ku bernameyên baş û dirust tên çêkirin, di kêliyê de pêşî li wan tê girtin. Ev derdor naxwazin tiştên baş di nav de gel de belav bibin. Ji ber ku ev derdor pêşketina civakê ji xwe re wek xetere dibînin. Ew jî dizanin dema civak bi pêş bikeve dê li hemberî desthilatdariyê bisekine. Ji ber vê yekê jî paşxistina civaka kurdî dixwazin. Mînak tayînkirina çapemenî û dezgehan giştî bi biryara desthilatdaran tê kirin. Ji aliyê gerînendeya çapemeniyê ve naveroka hemû bername û nûçeyan tê amadekirin û bi giştî jî ev kes jî girêdayî van derdorên desthiltdaran in. Tenê carinan di hin pêşkêşvanan de em dikarin qala nîvazadiyê bikin û jixwe ev kes jî ji aliyê hişmendiyê ve zêde pêşketî û xwedî îrade nîn in. Bi giştî li gor mêvanan tevdigerin. Ji bo vê yekê jî bername bandoreke erênî li civakê nake."

**Çîrokên kurdistanî nabin mijar**

Sirûşt Cemal her wiha derheqê sînemayê de jî destnîşan kir ku di qada sînemayê de kurd hê nû bin jî astek heye û wiha domand: "Karên sînemayê yên heta niha hatine kirin kêm in, yên li salona sînemayê hatine nîşandan piştre careke din nehatiye dîtin. Ji bo kurtefîlman, belgefîlman û masîvanan bêhtir gav hatine avêtin. Li Kurdistanê bi hezaran çîrokên girîng hene lê mixabin heta niha jî ev nebûne mijar û li ser van mijarên kurdistanî fîlm nehatine çêkirin. Mînak, tevî hemû şer û pirsgirêkên civakî, pirsgirêkên jinan, pirsgirêkên partiyên siyasî û desthilatdariyê li Kurdistanê hene, bi deh hezaran çîrokên girîng hene, lê heta niha ji vana berhemên sînamayê nehatine çêkirin. Li her çar parçeyên Kurdistanê derhênerên me hene ku di asteke baş de ne. Ji ber tunebûna senaryoya akademîk pirsgirêk di çîrok, senaryo, derhêner û lîstikvanên hatine hilbijartin de, derdikevin."

**'Naverok û çîrok xirab in'**

Cemal di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku piştî pêşketina cîhana teknîkî, beşa teknîkî li Kurdistanê jî pêşketiye û di fîlman de teknîk baş tê bikaranîn û wiha got: "Mixabin naveroka xebata wan bê wate ye. Di warê rêzefîlman de em dikarin bêjin ku ji aliyê teknîkî ve pêşketî ne. Lê naverok û çîrok xerab in. Gelê Başûr ji ber nelirêtiyên kanalên herêmê yên ku rêzefîlmên biyanî yên wek Tirkiye, Kore û Hindistanê didin, gel berê xwe didin Facebook, Tîktok, Instagramê. Bêguman ev rêzefîlmên biyanî ji her alî ve zirareke mezin didin civaka kurd. Bi kurtasî her diçe civak ji TV'an dûr dibe."

**'Hêvî bi ciwanan heye'**

Lîstikvana başûrî Sirûşt Cemal bal kişand ser hin xebatên ciwanên li Başûr û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li gel van hemû kêmasiyan, li gorî paşerojê niha destpêkeke hêdî heye, komek ciwanên jêhatî weke kurtefîlman xebatên bilind çêkirine û di nav wan de wênekêşên pêşketî jî hene. Eger xebateke zêdetir were kirin an jî rayedarên peywendîdar bi piştevanî û hevkariyê bên kirin, di paşerojeke nêzîk an jî dûr de hêvî heye ku serkeftin were bidestxistin."






# E-Pirtûka kurdî ya dijîtal

Şirketa Botan Internationalê bi piştgiriya Rojnamegerên Sînornenas (RSF) Kargeha Rojnamegeriya Kurdî di navbera 15-21'ê kanûna 2020'î de pêk anîbû. Kargeha ku 15 rojnameger perwerde dabûn, ji 28 dersan pêk hatibû.

Botan International yekem sazî ye ku li Tirkiyeyê perwerdeya rojnamegeriya dijîtal daye. Di kargehê de Ferîd Demîrel, Murat Bayram, Gulistan K. Rençber, Ibrahim Seydo Aydogan, Mesûd Mûhemmed, Safiye Alagaş, Şîraz Baran, Hatice Kamer, Muri Darida, Rêdûr Dîjle, Mahmut Bozarslan, Omer Faruk Baran, Dr. Isabel Kaser û Alî Duran Topuz ders dabûn.

Piştî perwerdeya onlînê ya kargeha dijîtal PDF'a vê kargehê jî wek 'E-Pirtûk' li ser malperê hat weşandin. Edîtoriya E-Pirtûkê ji aliyê Murad Bayram ve hatiye kirin. Ji mijarên wek amadekirin û pêşkêşkirina vîdeo-nûçeyan, podcast, nivîsana nûçeyên ji bo medyaya dijîtal, ajansên nûçeyan û nûçegihaniya ajansan, rojnamegeriya jinên kurd û nûçegihaniya wêneyan pêk tê.


Der barê E-Pirtûkê de edîtor Murad Bayram wiha dibêje: "Armanca me ew e ku weke belgeyekê, weke rêberekê kesê bixwaze rojnamegeriya kurdî ya dijîtal bike ev pirtûk hebe. Ji bo wê me hemû gotarên dersan kom kirin, ji bo li ber destê wan bi awayekî belaş, bi awayekî dijîtal û bi awayekî bikaribe xwe zû bigihînê rêbereke çêkirina nûçeyan, hevpeyvînan û birêvebirina medyaya dijîtal hebe." ***AMED***


# Dad êdî bi kurdî ye

Endamên Lijneya Zimanê Kurdî ku di bin banê Baroya Amedê de hatibû damezirandin, dest bi weşandina kovareke bi navê 'Aşdad' dikin. Kovara hiqûqî ya kurdî dê sê mehan carekê derkeve. Hejmara yekemîn a kovara Hiqûqê dê 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê derkeve. Der barê kovarê de seroka Lijneya Zimanê Kurdî Elîf Bîrkîlî axivî.

Bîrkîlî di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku kovara hiqûqî ya bi zimanê kurdî pêdiviyek e û wiha got: "Fikra kovareke bi zimanê kurdî di çarçoveya civînên me yên 'Lijneya Zimanê Kurdî' de hat pêşniyarkirin. Wekî ku tê zanîn di qada hiqûqê de weşanên zimanê kurdî bi sînor û demkurt in. Lewra di vê qadê de pêkanîna têgihnasînan pêwîst e. Ligel vê yekê bi saya vê xebatê, dê aliyê hiqûqa kurdî de wek peywira arşîvê bibîne. Tê zanîn ku hiqûq her tim bi pêş ve diçe û dîsîplînek ji veguhastinê re vekiriye. Bi vî awayî ligel pêşxistin û veguhastinê, em ê bi xebatên xwe bibin parçeyek ji bo pêşxistina zimanê kurdî."

Bîrkîlî anî ziman ku armanca wan a sereke di qada hiqûqê de domdarkirina hebûna weşana bi zimanê kurdî ye û wiha pê de çû: "Ligel vê armancê em ê têgeh û mijarên hiqûqî bi zimanê xwe nîqaş bikin û li ser van nîqaş û nirxandinan bi zimanê xwe hilbêrînin. Di heman demê de em dixwazin di her qadên jiyanê de; wekî sînema, wêje, mîtolojî û hunerê de hebûna hiqûqê derxin pêş. Her wiha em ê bi hevpeyvînên hiqûqnasan hem ked û xebatên di hêla hiqûqê de bidin nasîn hem jî geşedanên aliyê hiqûqê nîşan bidin." ***AMED***




# Keşeyê dêrê dîroka Medan nivîsî

Keşeyê dêra protestanan Ender Peker pirtûka bi navê 'Di pirtûka pîroz de Med' nivîsî. Pirtûka ku ji wêşanên Yayê derket, bi kurdî û tirkî ye. Keşeyê dêrê Ender Peker bi salan li ser pirtûkên pîroz ên wek incîl, zebûr û tewratê lêkolîn kirine. Di encama 11 salan de ji nîşeyên xwe yên der barê dîroka Medan de pirtûka bi navê 'Di pirtûka pîroz de Med' dinivîse. Di berga paş a pirtûkê de wiha tê gotin: "Di Pirtûka Pîroz de paşeroj û rabirdûyeke kûr û mezin a Medan heye. Ev paşeroj bi wehiyên xwedê, bi rêya pêxemberan hatine qeydkirin û îro jî der barê Medan de rê nîşanî me didin. Heke qeydên nivîskî tune bin, divê em ji rastiya agahiyên xwe yên demên berê bawer bin. Piraniya neteweyan tarîxa xwe nivîsîne û qeyd kirine. Lê mixabin Med di vî warî de zêde bi ser neketine. Li dinyayê gelek tarîx hene ku qet pêk nehatine, lê çawa ku pêk hatine, têne nîşandan. Ji ber vê yekê em nivîsên dîrokzanên pêbawer, ji xwe re wekî rêber dibînin." ***AMED***

# xwebûn

15-21 Sibat 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 61

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:***
Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:***
İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:***
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli

***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85


# Pîvanên klînîkî û derûnî yên grevên birçîbûnê




Dr. Abdullilah Polat


Grevên birçîbûnê yên dema bidawîanîna wan nediyar û bêveger ên ku di wateya psîkolojîk û di heman demê de jî di çarçoveya bijîşkî û civakî de gihîştine qonaxeke pir krîtîk, berî her tiştî acîliyek girîng pêk tînin. Pîvana herî girîng a vê lezgîniyê pîvana "watedayînê" ye. Di çerçova psîkolojîk/derûnî de, sedema herî girîng ku divê mirovên di greva birçîbûnê de biryarek wisa bidin, ew mijarên ku siyasetmedar neçar in wan bi rengekî çalak çareser bikin.

Bi taybetî ya pir girîng ew e ku laş di birçîbûnê de razayî digel birçîbûnê hilweşînek mezin jî bi xwe re tîne. Ev tê vê wateyê ku her roj, bi hejmarek diyar şane ji laşê mirovan winda dibin û ji nû ve pêdiviya laş bi vana çêdibe. Ji ber ku kesên di greva birçîbûnê de ne hin mîneralan, vîtamînan, enerjiyan, rûn û proteînên ku di damezrandina şanikê de girîng in û hewce ne red dikin, kêmbûna wan di westandin û ji taqetê ketina laş de roleke girîng dilîze. Wekî din, ji ber ku laş her gav xwe dilivîne, ango, ew bi berdewamî di nav tevgerê de ye û enerjiyê dixwe, ev yek gav bi gav dibe sedema windabûna hêz û enerjiyê. Şanîdera yekem dayîna kîloyan e, ew di forma kêmbûna giraniya laş de aşkera dibe. Bi gelemperî, di 35 rojên destpêkê de 10 kîlo kêmbûnek navînî heye û gav bi gav kîlo kêm dibin. Ev kêmbûna giraniya laş di rojên paşîn de jî berdewam dike. Wekî din, rojê bi navînî 1,5 heya 2 lître av, bi qasî 4-5 kevçiyên şorbê şekir, 1,5-2 kevçiyê çayê xwê, 1 kevçiyek çayê karbonat vexwarinê û rojane bi qasî 100-500 mîlîgram pêdivî bi vîtamîna B1 heye.



**Bandora li ser organên jiyanî**

Piştî roja 55'an dest pê dike, li organên girîng ên mirovên di greva birçîbûnê de bandor dibe û ev rewşa hanê ji bo laş pêngaveke nû ya veguherînê diafirîne. Tê zanîn ku dibe encamên wekî têkçûna dil û gurçikê çêbibin û di heman demê de, lawazbûna masûlkeya dil ji ber lawazbûna zêde, ji ber jidestdana hêz û enerjiya hewceyiya laş pê heye dikare bibe sedema mirina ji nişka ve. Her wiha jidestdana xwînê û tevliheviyên mîna wê dikare di laşê mirovên gihîştine vê qonaxê de bê dîtin. Jidestdana xwînê dikare bibe sedema tevliheviya wêneyî û ev yek bi taybetî dîmenê rewşê tevlihev dike, ji ber ku ev tê vê wateyê ku şaneyên xwînê yên oksîjenê hildigirin ji xwînê kêm dibin. Pîvanên neurolojîk û psîkolojîk ên dibe ku ji ber kêmasiya vîtamîna B1 rabin ji bo bikaranîna enerjiya di laş de ji pêşerojê xwedî girîngiyeke taybet e. Di nebûna vîtamîna B1 de, molekulên navîn ên ku bandor li mejî dikin, derdikevin holê û ew dibin sedema avabûna ku em jê re dibêjin psîkolojiya Wernicke-Korsakoff (tevliheviyên neurolojîk).

Li gorî çavdêriyên min ên van grevên birçîbûnê û têkiliyên min ên rasterast bi hin kesên ketine vê grevê re, divê hevsengiya wan a giyanî ya heyî bi berxwedana wan re û bi vîna wan re were fahmkirin. Ji bo ku meriv ji van "çalakiyên" van mirovan fam bike, bikêrhatina wan bi tevahî kêrhatî ye. Bi gotinên din, wateyek tenê bi lêpirsîna raboriya wan, bi dîtina nirx, rastiyên ku ew pê re ne û qonaxên serpêhatiyên wan ên sereke ku ew jiyane dikare were dayîn.

Ev têgihîştin di heman demê de nîşan dide ka ew bi vîneke çawa tevdigerin û her wiha bi vî awayî hevsengiya wan a giyanî û derûnî tê fêmkirin. Ji ber vê çendê ye ku xala herî hevpar a gelek ramangeran ew e ku di bingeha piraniya xirabiyan de tunebûna berxwedanên mezin heye. Xwedî dîrokek tije îşkence, şer, çewisandin, zordarî, girtin û sirgûniyê, ev mirovên ku xwediyê dîroka gelek neheqî û zaliman in, digel derbasbûna salan berê jî bi baweriyek xurt jiyane. Di vê wateyê de, gotina vê baweriya vîna, "Laş, çiqas berxwedêr be jî; dil li laş serdest e" girîng e.

Ji aliyekî ve, ev mirovên di grevên birçîbûnê de nefretê ji tiştê ku berê dikirin, di heman demê de bi vîna kesên sereke re di nav tekoşîna ku ji wan tê de bi vê berxwedana civakî re bûn yek. Benjamin Disraeli wiha dibêje: "Tu tişt nikare li hember îradeya mirovê ku dikare hebûna xwe ya laşî jî ji bo armanca xwe feda bike, li ber xwe bide." Bi gotineke din, heke çend qonaxên rabirdû yên ku wan jiyan kirî, wan ber bi serpêhatiyeke ku dikare jê re wekî îflasa psîkolojîk û giyanî ya kesane were gotin rê nede, berevajî wan ev bi şerê îradeyê ve xwe dispêrin hêza xwe. Ev wekî bilindkirina exlaq û vînê bi tevahî û her wiha qîrîna kesên li dijî zordariyê di psîkolojiyê de tê vegotin û pênasekirin. Berxwedana li dijî neheqî û zordariyê wekî awayê herî hêsan ê casaretekê tê dîtin. Mark Twain diyar dike ku cesaret li dijî tirsê çalakiya herî mezin e û cesaret berxwedana li hember tirsê ye.

"Ger mexlûqek bi qismî tirsonek nebe, jê re mêrxasî digotin ne pesn e." Ji ber vê yekê, wateyek kûr a vê çalakiyê heye ku têgînên civaknasî û derûnî û hem jî civakî û dîrokî di xwe de digire. Diyar e ku peywirek bi çi rengî dikeve ser van kesan, heta ku rewşa giyanî ya van mirovan tenê bi pîvana psîkolojîk û bi tevahî rastiyên civakî were hesibandin.

## Qonaxa krîtîk

Destpêkirina pirsgirêkên tenduristiya kesê di greva birçîbûnê de, li gorî cih û mercên ku ew kes lê dimîne diguhere, lê bi gelemperî ev dema krîtîk piştî roja 40'î dest pê dike. Piştî vê demê, hem têkçûna organan û hem jî lawaziya laş a gelemperî dest pê dike û bi vê pêvajoyê re dirûvê tevn û fonksiyonên bedenê sînordar dibin. Ew zirar li laş çêdibe, dikare bibe sedema jidestdana jiyanê. Windakirina tevnê di qonaxên paşîn de xwedî girîngiyek jiyanî ne û di encamê de, ew xuyanga lawaz û her weha tevliheviyên di organên sehekî de pêk tîne. Tevliheví yan jî lawazbûna tahmgirtinê, her diçe pir caran tinnitus, hestiyariya li hemberî ronahiyê û zêdebûna hestiyariya bêhnê, nemaze li hember bêhnên xirab, ji van nîşanan çend in.

# Xêrxwazê Cejna Xidir Îlyas û Xidir Nebî




Ayhan Erkmen


Ev hefteya pêşiya me, ya Cejna Xidir Îlyas û Xidir Nebî ye. Ev cejn her çiqas ji aliyê gelek gel û baweriyên cuda ve jî tê pîrozkirin lê wateya wê ji bo êzidiyan cuda ye. Li gorî baweriyê "Xidir Îlyas û Xidir Nebî du milyaketên piştevan in, dema ku ferman li ser civaka êzidiyan tê meşandin tên hawara wan."

Herêma Bişêriyê ya ku demekê bi 365 gundên xwe ve bi navê Êzdîxanê dihate binavkirin, mixabin di roja îroyîn de hema di çend gunden de, çend malbatên êzidiyan mane. Ew jî bêhtir kal û pîr in, kesên ciwan nemane, herî dawî di salên nodî de koçberî Ewropayê bûne.

Ev gundên ku malek, du lê mane yek jî Texerî ye. Texerî niha taxeke navçeya Bişêriyê ye. Kekê Orhanê Texeriyê di vê herêmê de ji sala 1980'yî şûndetir wek xêrxwazê Cejna Xidir Îlyas û Xidir Nebî ye. Ji bo vê di mala xwe de dezge ava kiriye, aşekî biçûk jî çêkiriye.

Hefteya li pey 13 sibatê, hefteya Cejna Xidir Îlyas û Xidir Nebî ye. Li gorî salnameyê carinan sê, çar rojan paşve jî dikeve. Li rojên sêşem, çarşem û pêncşemê rojî tê girtin û roja îniyê jî eyd tê pîrozkirin. Li gorî baweriyê rojî li ser her kesî ne ferz e.

Ji bo vê cejnê du dana, du xwarinên taybet tên çêkirin. Heft zadên ji erdê çêbûne yên wekî, genim, garis, nîsk, nok, dendikê zebeşan, dendikê petêxan, gulberojk û hwd. tevlî hev dikin û li ser sêlikê diqelînin. Vî zadî dihêrin, dikin pêxûn ango arvan. Li gorî baweriyê bi vê bereket dikeve sala nû û dinyayê.

Kekê Orhan bi qasî sed kîlo pêxûn dihêre. Vê ji bo xêra dê û bavê xwe, gund bi gund û mal bi mal belav dike. Di fermana 74'an de dema ku êzidî ji Şengalê tên herema Bişêriyê û di wargeha gundê Qorixê de dimînin, kekê Orhan rojek berî eydiyê pêxûna para wan jî dibe û belav dike.

Roja eydiyê bi berbangê re av tê kelandin -bawerî ew e ku wê rojê av jî nû dibe- peyre pêxûnê hedî hedî berî nav didin û pê re tevdidin, heya ku tîr dibe, dibe wek helawî û ev pelor e. Ji aliyekî ve jî dimis germ dikin û rûn diqijilînin. Pelorê dikin feraqan, dimis û rûn lêdikin, ewil ji feraqekê ji xêra miriyan jê vediqetînin û yên din dixwin.

Ji bo şîvê jî şilk tê çêkirin. Bi wî arvanî hevîr tê hasilandin û li ser sêlê wek nanê sêlê, nanekî tenik tê petandin; wî nanî hûrî tebaxan dikin, ser wî li gorî wî jî rûn digerînin; ji vê jî ewil ji tebaxekê ji bo xêra miriyan jê vediqetînin û dest bi xwarinê dikin. Li her carê ew xêra miriyan ji cîranan re tê şandin.

Li gorî baweriyê, Xidir Îlyas û Xidir Nebî jî bi tevî şêniyên malbatê taştiya xwe û şîva xwe dixwin û li hespên xwe siwar dibin, berê xwe didin warên xwe.

Ji bo keç û xortên êzidiyan, taybetmendiyeke cuda ya vê eydiyê jî heye. Ji bo wan eydiya bext û mirazê ye. Li gorî baweriyê, hemû ciwan nebin jî, yên dixwazin, şeva eydiyê, berî razanê sê sêwikên şor dixwin û radizên, di xewnê de kê ku av dirêj kir, ew mirazê wê/wî ye.

Cejna we pîroz be. Mirazê we bi dilê we be. Bila Xidir Îlyas û Xidir Nebî bên hawara we.

